

ARMANC
Ji mehê
carekê
dertê
Hejmar: 103
Nisan
1990
Buha: 10 Skr.
3 DM

Armanç

ARMANC
Monthly
Kurdish
Magazine
No: 103
April
1990
Price: 10 Skr.
3 DM

SERXWEBÛN DEMOKRASÎ SOSYALÎZM

Piştî ku di meha Adarê de li gelek qeza û bajarên Kurdistanê gelê me yê mîrxas li dijî terorê, zordariyê, surgûniyê, kuştin û valakirina gundan serî

hilda, dewleta kolonyalîst a Tirk di 9'ê Nisanê de bi qanûnên taybetî li Kurdistanê îdara orfî ilan kir û hemû selahiyet da destê Waliyê Kurdistanê.

Sekreterê (TSK)

Zekî Adsiz
Wefat Kir

Fermana Sansur û Surgûnê: "Qerarnamên SS"

Piştî ku di meha Adarê de li gelek qeza û bajarên Kurdistanê gelê me yê mîrxas li dijî terorê, zordariyê, surgûniyê, kuştin û valakirina gundan serî hilda, dewleta kolonyalîst a Tirk di 9'ê Nisanê de bi qanûnên taybetî li Kurdistanê "îdara orfî" ilan kir û hemû selahiyet da destê Waliyê Kurdistanê.

"Qerarnama di hukmê qanûnê" de ku di 9'ê Nisanê de bi pêşniyara Konseya Ewlekariya Milî û bi beşdarbûna Serokkomarê Tir-

têb, telewîzyon û radyo wê bîn kontrolkirin. Çapxaneyên ku kovar û rojnameyên pêşverû çap bikin, wê bîn girtin.

Piştî ku ev qerar hat stendin polîsên siyasî yên Stenbolê li hemû çapxanayan geriyên ew temîkirin ku ew kovar û rojnamên ku li ser Kurdan û li ser sosyalîzmê dinivîsîn çap nekin. Kovara 2000'e Dogru nesîbê xwe ji vê qanûnê stend. Çapxana ku "2000'e Dogru" çap dikir, piştî vê

rin. Di 18'ê Nisanê de berpirsiyarên 21 kovarên ku li Stenbolê derdikevin bi meşekê ve qanûn bi tundî protesto kirin. Li Diyarbekrê, Mêrdînê, Wanê, Sêrtê, Hekariyê, Rihayê û li gelek bajar û qezên din ji bo ku xelk vê qerarê protesto bike bi heftan rojnamên Tirkî yên rojane nekirin û bi vî hawî di tirajên rojnaman de kêmayî çêbûn.


Ji bo "cûdaxwazan" ceza wê du car zêde bibe.

Ev jî dikeve Xala Qa-

wan di mala xwe de bi-hewînin, ji 3'ê salan heta 5 salan wê ceza ji wan re bê dayin. Li gora vê qanûnê ev ceza dibe du qat. Mana vê jî vekiriye; dewlet dixwaze alîkariya xelkê ji ser şoreşgerê Kurd qut bike.

Cezayên kesên îtirafçî wê kêmkirî û ji wan re pere bê dayin.

Ev qanûn herçiqas piştî 12'ê Îlonê derketûbû lê bi vê qerarnamê muhtewa vê xalê firehtir dibe. Eşkereye ku dewleta kolonyalîst a



Sekreterê Giştî yê Tevgera Sosyalîst a Kurdistanê (TSK) Zekî Adsiz (K. Saleh) di 17'ê Nisanê de li Almanya Federal ji nexweşiya qanserê wefat kir. Cenazê Z. Adsiz di 23'ê Nisanê de şandin wê û di 24'ê Nisanê de ji bi meşek mezin li bajarê wî li Bîngolê hat veşartin.

Zekî Adsiz di sala 1948'an de li bajarê Bîngolê hat dinê. Ji ber xebata xwe ya şoreşgerî di 12'ê Adara 1972'an de ket hefsê. Piştî derketina ji hefsê Zanîngeha Rojnamegeriyê xelas kir û wek rojnamevan xebitî. Ji ber hin nivîsên xwe 10 meh ceza xwar û 6 mehan jî surgûnî Diyarbekirê bû. Li Diyarbekirê nûnertiya DÎSK'ê a Mintîqa 10'an kir û bû serokê Sendîqa Genel İşê ya Diyarbekirê. Di sala 1979'an de ji ber xebata salvegera 15 û 16'ê Hezîranê carekê din hat girtin û îşkence dît.

Zekî Adsiz, di sala 1974'an de di nav PSKT de cihê xwe girt û bû endamê Komîta Merkezî ya partiyê. Piştî 12'ê Îlonê çû Kurdistanê Îranê û demekê li wê ma. Di sala 1982'an de ji PSKT veqetiya û bi navê TKSP-Roja Welat xebata xwe ya siyasî domand. Û di sala 1986'an de bi KIP-GB re bûn yek û Tevgera Sosyalîst a Kurdistan damezirandin. Zekî Adsiz bû serokê wê.

Zekî Adsiz zewicîbû û bavê du zarokan bû. Z. Adsiz kadroyekî heja yê tevgera rizgariya Kurdistanê bû. Em wek redaksiyona Armançê ji malbata wî û hevalên wî re sebr û tehamul û sersaxiyê dixwazin.

Bi vê wefata ji nişka ve û bê wext, ne bes hevalên wî, herwisa gelê Kurd jî têkoşerekî heja wenda kir.



Li Kurdistanê teror, kuştin û surgûnkirin perçek ji jiyanê ye...

kiyê Turgut Ozal ve ji alî hukûmeta Yildirim Akbulut ve hat stendin, qerarnama hemû selahiyetê dide destê waliyê Kurdistanê. Bi kurtî qerar ev in.

Wê karibin herkesî surgûn bikin.

Mana vê qanûnê ev e ku kesên ku ji dewletê re serê xwe daneynin, zor û zilma dewletê qebûl nekin, û ji dewletê re muxbiriye nekin ji alî waliyê kolonyalîst ve wê bi kêfî karibin bîn surgûnkirin û ewê nikarbin li heq û huqûqên xwe yên formel jî bigerin.

Rojname, kovar, ki-

qerarê kovar çap nekir. Her wiha kovara Sendîqa Petrol-Îşê jî ji alî çapxanê ve

nûna Ceza Tirkiyê ya 168 û 169'an. Li gora xala 168'an kesên ku rêxistinên çekdarî

Tirk bi viya dixwaze mahkûmên siyasî teşwîqî teslîmbûnê û îxanetê bike.

TEVGER:

"Li dijî eşqiyatiya kolonyalîstan em xwe bikin yek û li ber xwe bidin"

rûpel: 4

nehat çapkirin. Li dijî van qeraran gel û berpirsiyarên kovarên pêşverû, sosyalîst bi tundî nerazîbûna xwe nîşan dan û bi tevgerên curbecur qerar protesto ki-

damezirînin wê herî hindik bi 15 salan bîn cezakirin. Li gor xala 169'an jî kesên ku alîkariya rêxistin û endamên wan bikin, silêh, nan, avê ji wan re temîn bikin û

Batman û Şernex dibin wîlayet

Yek ji nuxteyên vê qerarnamê ev e ku qezayên wek Batman û Şernexê wê bibin wîlayet. Ev herdu qezayên Kurdistanê jî di cihê stratejîk de ne. Ji van qezan re dayina statuya wîlayetbûnê; wê qontrola li ser xelkê zedê bike.

Dûmahîk r. 9

Nasir Rezazî:

"Muzîk zimanê hest û atfê mirov e"

rûpel 6,7

Împeryalîzm û Pîrsa Kurdî

rûpel 5

Rojeva Mehê

"Biryarnama Terorê"

Li hember protesto û xwenîşandinên geleri yên Kurdistanê bersîva hukûmeta Tirk bû derxistina "biryarnama terorê". "Biryarnama terorê" herçî ji alî hukûmetê ve hat darxistin lê di hukmê qanûnê de ye. Esas xwedêgiravî qanûn ji alî parlamentoyê ve tîn derxistin. Lê piştî 12 îlonê generalan qanûnek wilo derxistin ku hukûmet di halekî xeteriyê de dikare parlamentoyê bide alîkî û ew bixwe biryarên wilo bigre ku hukmê wan bi qasî hukmê qanûnan be. "Biryarnama terorê" jî bi vî awayî derket. Ev nîşana wê yekê ye ku di meselên esasî û heyatî yên welêt de, ne parlamento lê meqamên îdarî yên dewletê (Konseya Milî ya Ewlekarî ku di bin giraniya generalan de ye, serokkomar û hukûmet) xwedî biryar in. Di meselên wiha de parlamento ne dezgeyek biryarê ye lê xemlek xapînok a dewletê ye. Gava parlamento û dezgên hilbijartinê yên îrada gel xemla xapînok bin, eşkere ye ku çiqas nutuq li ser tîn dayin bira bîn dayin demokrasî di wî welatî de tune ye.

General piştî derba 12'ê îlonê hatibûn ser hukum, di van çend salên dawiyê de her çendî behsa vegera ber bi demokrasîyê dihat kirin jî bi tevayî xwe ji dezgên îdarekirina welêt venekîşandibûn û di rîya Konseya Miliya Ewlekarî re, bi saya ordî û muxaberatê welat di nav pencên xwe de hiştibûn. Bi saya vê yekê wan bi vê biryara dawî ya ku bi navê "Biryarnama terorê" tê binavkirin, carek din ciyê xwe di dezgên îdarî û biryarî de xurt kirin. Loma jî hin kes jî vê biryarê re dibêjin biryarnama derba (inqîlaba) duduyan.

Ev biryarnama du tiştên esasî raberî meriv dikin. Yek jê ew e ku biryar û rûdanên van çend salên dawiyê, hiştin ku mesela Kurd derkeve rojêya Tirkîyê û ya nevetewî. Bi firehî û eşkereyî, gelek tişt li ser pîrsa Kurdî; hebûna miletê Kurd û heqîtiya mafên wî yên milî û demokratîk hatin nivîsîn û axaftin. Pîrs ket nav parlamentoyê, insanên siyasî dest avêtinê, serokwezîr qala Kurdîtiya xwe kir. Wer lê hat ku li cem gelek kesan hêviyek mezin peyda bû ku hukûmeta Tirk, di dîroka xwe de cara pêşîn e ku wê dev ji siyaseta xwe ya sertîtiyê ya li hember miletê Kurd berde û ber bi nermbûnekê ve biçê. Heta ew qenaet peyda bû ku, hukûmet wê hebûn û hin mafên gelê Kurd qebûl bike. Lê ev biryarnama wek mîrkutekî li wê hêviyê ket û belawela kir. Protesto û xwenîşandinên Kurdistanê bû sedem ku diranên qîç ên hukûmeta devbixwîn carek din beş bibin û biin nîşana wê yekê ku dewleta Tirk dev ji siyaseta xwe ya êrîşkarî ya salan berdaye, wê hin bêperwatur bimeşîne, wê hin gelek xwîn bê rêtin, wê hê gelek surgûn û talan pêrgiyê gelê Kurd bibin.

Noxta duduyan jî ew e ku, bi salan e, dewletê îdia dikir ku li hember terorê şer dike, ne ku li hember gelê Kurd. Lê hukmên ku di vê biryarnamê de hatine bicîkirin, berê tu yekê jî wan jî ne li bûyerê ku ew bi "terorê" îtham dikin. Biryarnamê bi tevayî berê xwe daye kes, hêz û dezgên demokratîk û geleri yên ku ew bi xwe hedefa terora dewletê ne. Azadiya çapemeniyê hat rakirin, tehdîda sansorek xurt li ser wan e ji roja ku biryar derketine heta îro rojname bûne wek berdevkên resmî yên dewletê û firotina wan bi carekê de %30 daket. Kovar û rojnamên şoreşger, sosyalîst û pêşverû yên Kurd û Tirk, tu çapxanan nabînin ku bîn çapkirin. Her çapxana ku van kovaran çap bike dikare bê girtin. Fealiyetên sendîkan, komelên demokratîk û insanî bûne tabîê îznê, hukûmet li pey hev girevan qedexe dike. Hukûmet hewl dide ku masuniyeta wan parlamentaran rake ku bi pîrsa Kurdî dibîlin. Cezayên îdamê yên bi sedan kesî li parlamentoyê ne, hukûmet dixwaze ku biryara îdamkirina wan ji meclîsê derkeve. Waliyê herêma Kurdistanê her gundê ku bixwaze dikare vala bike, heta dikare hakim û mudeîumanan jî ji wazîfên wan bide girtin û bi qanûn wê kes nikaribe hesabê vê yekê jî wî bipirse. Not hezar kadro hatin tespîtkirin ku endamên eşîran bikin milîsên bi meaş. Ev biryar yek jî ne li hember "terorê" ne lê li hember gel, dezgehên geleri û têkoşîna geleri bi xwe ne. Loma jî eşkere ye ku tîrsa dewleta Tirk a mezin ji gel bi xwe ye. Protestoyên geleri yên vê dawiyê, her çendî protestoyên nerm û aşîdar bûn jî ji ber ku geleri bûn cara pêşîn bi vê redevyê tîrs di hukmê fîrandîn. Eşkere kirin ku dewlet bi rastî û di esasî de ji çî ditirse û ji çî natirse. Wê aliyê xwe yê herî qels jî bi vê yekê derxist meydane.

Jirî û hostatî ew e ku meriv karibe bide ser aliyê dewleta Tirk ê qels, gêdûkê di wir de veke.

* Hin rojnamevanan navê wê kirine "Biryarnama SS" ango biryarnama Surgûn û Sansurê"

Ma Seddam îro bû qesabê Bexdayê?

Di destê me de çekên kimyayî yên wisa hene ku gava Îsraîl êrîşî me bike, emê nivê welatê wan ji ortê rakin. Piştî van gotinên Seddam Husên, Rojava keşif kir ku Seddam "dijminê gel e", "qesabê Bexdayê" ye



Di destpêka meha Nisanê de li Îngilîstanê gumrukê dest da ser 8 "boriyên" gelek mezin ên ji polê ku bi gemiyê diçûn ji Iraqê re.

Hukûmeta Îngilîstanê bi hawakî resmî beyan kir ku van 8 "boriyên" jî alî gumrukê ve hatine girtin wê jî bo avakirina topek gelek mezin bihatana bikaranîn. Ekspertên gumrukê jî wek hukûmetê û Wezîrê Ticaretê gotin ku, "Borî jî bo topeke 40 mîtro lûledirêj hatine çekirin. Û heger ev proja Iraqê bi ser keve, Iraq wê karibe bi çekên kimyayî û atomî êrîşî hemû cîranên xwe bike."

Borî (ya jî lûlên topê) jî alî şirketek Îngiliz ve (navê wê Forgemasters e) hatibûn çekirin. Dûre şirketê jî da diyarkirin ku haya Wezîretê Îndustriyê jî vê temiya Iraqê hebûye. Û jê wêdetir

jî, cardin li gor beyana şirketan "boriyên" ku hatin girtin jî partiya dawî bûye.

Seddam restê dikşîne

Piştî girtina "boriyên" Seddam beyanek da, got: "Çekên me yên nukleer tune ne, lêbelê di destê me de çekên kimyayî yên wisa hene ku gava Îsraîl êrîşî me bike, emê nivê welatê wan ji ortê rakin."

A piştî van gotinên jorin Amerika û Rojava dengê xwe li dijî rejîma Seddam bilind kirin, telewîzyon, radyo û rojnamên ku heta nuha çaxa qala rejîma Seddam dibû pîrr bi zîmanekî "diplomatik" dipeyivin, bi carekê de uslûba axaftinên xwe guherandin û bi gotinên giran rexne li Seddam girtin; gotin "Dijminê gel, dîktator, qesabê

Baxdayê." û hwd. Çimkî îcar hedefa tehdîdên Seddam bes ne Kurd û İran bû; bi hawakî eşkere Îsraîl bû û ev jî pîrr zêde dibû; beguman Rojava hewqasî jî nikare daqurtine.

Ewrûpa nuh bi qesabiya Seddam dihesê!

Çaxa Seddam Husên bi bol-dozeran bajarên Kurdan Xurmal(17.000), Pencilwîn (31.000), Çeman(35.000), QelaDîza(80.000), Dihok (50.000) Senguser(42.000), Helepçe(22.000) jî binde wêran dikir, 5000 kes li Helepçe bi çekên kimyayî dikuşt, 4000 gund bi erdê re tep û dîz dikir, 500.000 Kurd bi darê zorê jî erd û avên wan radikir û dikir kampên eşîran, 100.000 Kurd jî ber êrîşên çekên kimyayî xwe diavêtin nav "sinorên" Tirkîyê û Îranê, "Xerba merkeza demokrasîyê" li hember van kirinên hov gelo çima bîdeng ma (bê guman welatên sosyalîst jî bin de dengê xwe nekirin, hetta car-carna jî kirinên Seddam parastin. Lê nuha mijara me ne ev e), çima wek nuha dibêjin, jî Seddam re negotin "qesabê Bexdayê?" Negotin û wek îro êrîş jî nebîrin ser. Wer xuyaye jî bo Xerbê, firotina çekan jî xwîna Kurdan a Seddam diherikand gelekî muhîmtir bû. Dema Seddam bombeyên jahre bi ser serê Kurdan de dibarand welatên Ewrûpa jî bo ku çekan sileh bifroşin Seddam xwe di ber hev re dikirin.

"Proja Babîlon"

Di meşeke jî bona şehîdên Helepçe de, Wezîrê Karûbarê Derve yê Swêdê Sten Andersson li dijî Seddam du gotin kir, roja din Sekreterê Kabinê Pierre Schori çû Iraqê jî Seddam "uzîr" xwest; jî bo ku Seddam, ambargoya danîbû ser şirketên Swêdî rojekê berî rojekê rake. Û bi rastî jî Pierre Schori bi ser ket, gelek peymanên ticarî hatin imzekirin. Qet şik tune ye ku sistî û nermayîtiya dinyayê cesaretek mezin da Seddam. Û bi saya vê toloransa dinyayê, Seddam iro dixwaze çekên hin bi tesîrtir bi destê xwe xe. A topa 40 mîtro lûledirêj, yanî "Proja Babilon" ê gava pêşîya vê armancê ye.

Redaksiyon: M. Elî, Zinarê Xamo, Hesen Mizgin, Lewend Firat, Mîrza Bextiyar. Redaktorê berpirsiyar: M. Elî. Berpirsiyarê beşê Dimilkî: Malmîsanîj

Adres: Armanc P. Box: 6004 172 06 Sundbyberg Sweden

Telex: ATTN ARMANC 11063 TELE KC Telefax: ATTN ARMANC 46-8-801825

Ansvarigutglvare: Kurdîska Demokratîska Arbetar Unionen Postgîro: 50 37 99-9 ISSN: 0348 7385

Em çawa bikin:

Navê Welatê Kurdan Kurdistan e'

Di navbera 30'ê Adarê û 1'ê Nisanê de li paytexta Danîmarka li Kopenhagê li ser "Eqaliyetên Ewrûpa Başûr" konferansê çêbû. Konferans ji alî grûbên Helsinki ve hatibû amedekirin. Di konferansê de li ser rewşa 4 hindikayîyan (eqaliyetan) hat rawestandin. Yek, Kurdên Tirkîyê, dudu Tirkên Bûlgarîstanê, sisê, Macarên romanyayê û Tirkên Yunanîstanê.

Konferans, roja pêşî bi giştî li ser pîrsa hindikayîyan û roja din ji li ser her miletekî cihê cihê sekini.

Armanca Konferansê

Bi kurtayî armanca konferansê ev bû; ew dewletên ku îmze avêtine binê Peymana Helsinkiyê (35 dewletên Ewrûpa nin) di demê pêş de wê werin ba hev. Li gel gelek meselên din, pîrsa hindikayîyan ji di rojeva van dewletan de ye. İcar berî ku ev konferansa mezin çê bibe, grûbên Helsinki bi hev re ev "Konferansa Eqaliyetê Ewrûpa Başûr" çêkir.

İnsanên ku di vê konferansê de beşdar bûn, kesên ji Koma Miletan bûn, Musesên Mafê Mirovî bûn, wek Amnesty International "Grûba Parastina Mafên Eqaliyetan û hwd.

Bêyî van rêxistinan, çend kes ji hatibûn vexwendin ji bo ku qala miletê xwe bikin. Ji bo vê yekê ji her miletekî re masayek hatibû danîn. Di masa Kurdan de Prof. Mumtaz Soysal, Dr. İsmail Beşikçi (İ. Beşikçi ji ber ku wê demê hatibû girtin, nikaribû beşdarî konferansê biba), Eşref Okumuş, Sertaç Bûcak û Omer Şexmûs (beşdar nebû) hatibûn gazikirin. Li alî din gelek kes ji wek mêvan hatibûn konferansê. Di grûba Kurdan de li dora 40 mêvanî hebûn.

Li gor programa konferansê, piştî munaqeseyên roja pêşî, wê ev grûb bigihîje hin netican, netice wê bibin biryar û biryar ji wê bibin tewsiya vê konferansê ji konferansa mezin ku wê di rojên pêş de bicive; yanî ji konferansa dewletan re.

Tiştên Pozîtîv

Di konferansê de bêyî grûba Kurdan, tu grûbeke miletekî din nikaribû bigihîje hin netican û hin biryaran bistine. Ji ber ku dîtîr pîrr dûrî hev bûn, loma ji li ser girtina biryaran li hev nekirin. Lê li ser Kurdan 11 biryarên konkret hatin girtin, ku ev ji

neticeyê gelek pozîtîv bû.

Di roja pêşî ya konferansê de li ser înkana guherandina Peymana Helsinki û Qanûna Konseya Ewrûpa hat rawestandînk ji bo ku mafê eqaliyetan hin baştir karibe bête parastin. Çim-kî Tirkîyê peymana Helsinki îmze kirîye, lê wê girê nade; tenê ji alî ehleqî ve girê dide. Yanî gava Tirkîyê li dijî vê Peymanê tiştê bike-ku her roj dike- tu dewlet nikare li dijî Tirkîyê tedbîreke konkret bigre. İro, tenê dikarin ji alî ehleqî ve rexne lê bigrin, ku ji xwe Tirkîyê ji pîrr guh nade rexneyên wiha.

Lê heger ku di Peymana Helsinki û di Qanûna Konseya Ewrûpayê de li gor daxwaza vê konferansê hin guherandin bibin, wê çaxê ew dewletên ku îmze avêtine binê van peymanan bêtir mecbûr dibin ku weci-bên wan bi cih binin.

Biryarên ku ne bi delê Mumtaz Soysal bûn

Biryarên ku li ser Kurdan hatin girtin ji wan hin ev in:

◆Biryar li ser; "Qanûna di der Heqê Mafê Eqaliyetan" de

◆Biryar li ser; Qanûna Ziman.

◆Biryar li ser; Qanûna Çapemeniyê"

◆Biryar li ser 2-3 xalên "Qanûna Esasî li ser çend fiqreyên 141-142"

Biryara duduyan, bi surgûnkirina kesên û valakirina gundan Tirkîyê Peymana Helsinki yê îhlal dike.

◆Ya sisîyan, li Tirkîyê Mafê jîyanê di tahlûkê de


◆Ya çaran, divê navê welatê Kurdan rast bê nivîsandin, yanî ne "Dogu" û Guneydogu", raste rast Kurdistan bê nivîsandin.

◆Biryarêk ji li ser "Qanûna Rewşa İstisnâî" hat girtin.

Ji bo ku di derheqê Tirkîyê de van biryarên jorin û hin biryarên din neyên girtin Prof. Mumtaz Soysal gelek xweydan rijand, gelek xebitî ku millet iqna bike ku van biryaran negrin.

Prof. M. Soysal di axaftina xwe de wek hemû kevneperestan û wek ku dewlet dixwaze, Serihildana Şex Seid bi împeryalizma İngilîzan ve girê da û got "problema Kurd berhema İngilîza" ye.

Ji axaftina Prof. M. Soysal xuya dibû ku taktîka wî ev bû. Yek, tevgera Kurdan, ne ji bo bi destxistina mafên milî û demokratîk e, Kurd terorîst in hukûmet ji li hember terorîzmê millet



Berpirsiyarê redaksiyona rojnama "Ny Dag" Eşref Okumuş: Wexta tu ji insanekî navê wî bistinî, navê gundê wî bistinî û dû re ji navê welatê wî jê bistinî ..Gelo ev insan wê çawa bijî?

diparêze û hin tedbiran digre. Dudu, tevgera Kurdan netîca pîjkirina hêzên derve derketiye. Sisê, qet bahsa mafê mirovî neke, di delî ve ve bahsa meselên siyasî yê herî mezin, bahsa meselên maksîmalîst bike. Bi vî hawî ji nişanî konferansê bide ku avakirina dewletek Kurd pîrr zor e, ji alî "international" ve hema hema ne mumkûn e.


Ferqa zarokekî ji zarokên din...

Rojnamevan Eşref Okumuş di axaftina xwe de bersiva Prof. M. Soysal da got ku: Yekî Kurd ji roja ku ji diya xwe dibe û heta xortaniya xwe, dema hemû mafên ku Helsinki dayê, ku bi havakî minîmûm bi kar bîne bi kêmasî wê 50 sal ceza bixwe.

Û wek numûne ji jiyana zarokekî Kurda da;

-Kudek gava ji diya xwe dibe, ya li gund ya li bajêr tê dinê; ê we ji wiha ye, di vir de di navbera me de ferqek tune. Bes ferqek heye ku, navê wî **gundî** ya ji wî **bajêrî** hatiye guherandin. Di dû re wê dê û bavên wî zarokî bixwazin ku navekî lê kin. Lê memûrê nufûsê wê qeyd neke. Ku dê û bav isar bikin, wê wan bide mahkemê.

-Bêguman zarok wê dû re mezin bibe û wek zarokên we here mektebê, lê ewê bi salan ji mamostên xwe fahm neke. Piştî mezin bû ji divê gelek tiştî fêr bibe. Meselen, divê tu carî nebêje zimanê min Kurdî ye, ji ber ku qanûn jê re dibêje zimanê wî çî ye? Qanûn jê re dibêje zimanê wî Tirkîyê ye.



Prof. Mumtaz Soysal: "Problema Kurd berhema İngilîz e"

ribû, sîcdar sîcdar li erdê dinêrî. E. Okumuş axaftina xwe icar hinekî ji bi zimanekî mîzahî domand û wiha got: "Ya din, bi qasî ku ez dizanim Profesor Kemalîst e. Divê bizanibe, ku Musatafa Kemal bi xwe navê Kurdistanê bi kar aniye. Em dev ji M. Kemal berdin, Seddam Husên, ku iro li dinyayê wek diktatorê herî mezin tê naskirin, ew ji ji welatê Kurdan re dibêje Kurdistan. Axir navê welatê Kurdan Kurdistan e, çara vê tune, em çawa bikin!"

Bêyî van rexnen E. Okumuş, Sertaç Bûcak û gelek nûnerên din ji di axaftinên xwe de bi dîr û dirêjayî li ser rewşa Kurdan sekini, ji zulm û zora ku li wan dibe gelek numûne dan. Her wisa wan, bi gotinên gelek giran **sîr û pîvaz** di bîvîla berdevkê dewleta Tirk; Prof. M. Soysal ve kirin. Heger pozê wî bişewite wê careke din awûqatê parastina dozeke neheq neke û li ser navê dewletê beşdarî konferansên wiha nebe.. □

Navê welatê Kurdan Kurdistan e, em çawa bikin!

Li ser reaksiyona Prof. M. Soysal li hember bikaranîna navê Kurdistanê, E. Okumuş got: "Profesor ji gotina Kurdistanê, xwe pîrr aciz dike, ez bi xwe şaş dimînim. Du aliyê meselê hene. Yek jê, bi şexsiyeta Kurdan ve girêdayî ye. Wexta tu ji insanekî navê wî bistinî, navê gundê wî bistinî û dû re ji navê welatê wî jê bistinî...Gelo ev insan wê çawa bijî?"

Piştî van gotinên E. Okumuş, mîvan û nûneran bi çavên nexel nexel li Prof. M. Soysal mîzê dikirin û wî ji wek pisika ku şîr birjîne xwe topî ser hev kirin.

Nama nivîskar û şairên Bûlgaran:

"Jenosîda ku li Kurdan dibe bisekinîn!"

77 nivîskar, şair û rojnamevanên Bûlgarî nameyek ji serokê Koma Miletan **Havier Peres Du Cuelyar** ji serokê YKSS **Mixail Gorbaçov** û serokê DYA **Gerge Bush** re şandin.

Name wiha ye: "Em siyaseta şovenî û antî-demokratîk a rejîmên Tirkîyê, İranê, Iraqê û Sûriyê ku li dijî gelê Kurd dimeşînin bi xurtî protesto dikin. Em piştigiriya xwe bi gelê Kurd ê mazlûm re nişan didin ku ew ji bo serxwebûn û azadiya xwe tîkoşînê dide. Gelê Kurd ku nufûsa wî zêdeyî 25 milyonê ye û bê îrada xwe

di nav çar dewletan de perçe bûye û ji hemû mafên xwe yê mirovî bê par e: Heqê wan tune ye ku bi zimanê xwe pipeyvin, kultura xwe bi pêş xin. Li dijî Kurdan asîmlasyonê nedîtî tê ajotin û li hinek perçên Kurdistanê siyaseta jenosîd ten meşandin. Rewşa gelê Kurd xweş nişan dide ku mafê mirovî çawa tê îhlal kirin.

Em bangî hemû dewlet, rêxistinên navnetewî, hêzên demokratîk û aşîxwaz dikin ku dengên ji bo gelê Kurd ê azadîwaz bilind bikin û divê kultura wan bê parastin.

LI DIJÎ EŞQIYATIYA KOLONIALİSTAN EM XWE BIKIN YEK Û LI BER XWE BIDIN

Komîta Giştî ya Birêvebirî ya TEVGER'ê ku di meha Nisanê de civiya, li ser terora dewleta kolonyalist a ku van demên dawiyê li Kurdistanê bi hawakî hov li dar xistiye û li ser liberxwedana geleri ya ku gelê me rakiye piya, li ser bûyerên civakî û siyasî ên welêt rawestiya û berbirsiyariyên TEVGER'ê û hêzên demokratîk ên milî tespît kirin.



Meş, protesto û derebe daxistî-nên girseyî yên bi rojan ku gelê Nisêbînê bi bedêla şehîdekî, bi dehan birîndar û bi sedan girtîyan li dar xist, piştê li Cizîrê serî hilda ku buhayê wê pênc şehîd, bi dehan birîndar û bi sedan girtîbûn. Ev pêl jî wir gîhaşt Midyatê, Îdilê, Silopiyê, Dêrikê, Kiziltepe, Mazîdaxê, Çinarê, Farqînê, Diyarbekirê, Licê, Qozluxê û Hênê. TEVGER îlan dike ku ne wê hêzên dagirker ê ku îdîa dikin ev pêl jî alî welatên derva hatiye tahrîkkirin û di bin tehdîda hin hêzên çekdar de peyda bûne. Sedemê tik û tenê yê wê protestotiya gelêrî ya biheq ku pêl bi pêl belav bû, ew e ku dewleta kolonyalist a Tirk li ser erdên Kurdistanê yê dagirkerî bi taybetî van deh salên dawiyê, bi ordî, polîs, jendîrme, tîmên taybetî yên şer ku di nav gel de bi navê "çetên Ramboyi" tên naskirin û bi hê gelek mueseşe û dezgên xwe yên dizî û êşkere terorek li dar xistiye. Gelê Kurdistanê bi tevayî dijîn hatiye îlankirin û bûye hedefa vî şerê hov ê xwînî. Gundi bi cînayetan bi hîle û provakasyonan tên mecbûrkirin ku bi cemahîrî cî û warên xwe berdin, bar bikin. Di van du salên dawiyê de li Hekkarî, Sertê, Mêrdînê û Wanê hejmara gundên ku bi zorê hatine valakirin gîhaşt hezarî. Li herêmê tu gund nemane ku bi kêmasî nivê nifûsa wan vala nebûbe. Tevî hemû karakterên xwe yên antidemokratîk jî ew qa-nûnên ku li tevayîya Tirkîyê tên tebîqkirin li Kurdistanê nayên bikaranîn. Tiştên ku li Kurdistanê tên meşandin qanûnên rewşa awarte û hukmên şerê êşkere ne. Mala ku poîn sungûya esker neketibê nemaye. Rambo û çetên milîs dest davêjin, mal, can û namûsa xelkê û dawiya vî karî jî nayê. Tevî wê zilm û hovîtiyê di meha Adarê de dewletê pîrozbahiyên Newrozê û haziriyên protestoya Qetliama Helepçê jî kirin bahane û êrîş û operasyonên xwe zêde kirin, li bajar, qeza û gundan ev êrîş hatin berfirehkirin. Bi vî, kêr gîhaşt heştî û kela xelkê furiya. Elbet di pişt van protestoyan de terorek heye: Ev jî terora dewletê ye.

Dewleta diktatorî texmîna protestoyek wiha gelêrî nedikir ku wek babelîskê li Kurdistanê belavbû. Vê yekê hêrs û harbûna dewletê hê zêdetir kir, dest bi haziriyê êrîşên din kir. Bi lez û bez Konseya Ewlekarî ya Milî civîya, biryar da ku ji bo serê wê berxwedanê bê pelçiqandin, tedbîrên nû yên îdarî û eskerî bîn girtin û hemû partiyên burjuwazî li dor "mutabeqata milî" bigihên hev. Li gor vî talimatê, partiyên ser hukum û yên mixalefetê li koşka Çankaya di bin serokatîya reîsêcumhûr Turgut Ozal de civiyan ku berê wî meşrû nedihesibandin û bi destê wî jî nedigirtin. Mixalefetê bi Demirel û İnonüyê xwe ve piştgiriyekê temam da hukumetê û ordiyê ku êrîş bibe ser gelê Kurd. Piştî civînê Demirel da xwiya kirin ku "agir divê zû bi zû di kûra xwe de bê temirandin". İnonû jî bavê xwe zêdetir kir û gaziya şer da-

xist meydanê. Çapemeniya burjuwazî, bi çep û rastê xwe ve tevî karwanê "mutabeqata milî" bû ku îlana cihadekê kiriyê. Li her derê dengê defa hewarê tê.

Hukumeta Tirk bi derewan dibêje ku di bingehê van buyeran de terozîma cudaxwaz heye û dewlet li hember terore şer dike. Bi vî ew texmîn dike ku li ber raya giştî ya hindûr û derva wê karibe ruyê xwe yê reş veşêre. Lê belê ew biryarên ku di serokatîya Ozal de hatin girtin û paşê bîyî meclîsê bi biryara hukumetê ya bi hukmê qanûnê hat derxistin û ew tedbîrên îdarî, siyasî û eskerî yên ku hatin girtin, didin xwiya kirin ku terozîst hukumeta Tirk bi xwe ye û amanc ew e ku gelê bê suc bi terore bê pelçiqandin.

Ozal di civîna Çankayê de pêşniyar anî ku qararên îdamê ên ku li Meclîsê dipên bîn tebîqkirin û îmtîyaza mebûsên ku li ser pîrsa Kurdî radiwestin bê rakirin.

Bi wê biryara ku di hukmê qanûnê de ye û Waliyê Rewşa Awarte yê Herêmê qasî eşqîyakî bîperva dike, tê xwestin ku gundên Kurdanê hê zûtir bîn valakirin, ew kesên welatperwer yên binamûs bi giştî jî herêmê bîn sirgûn kirin, çapemeniya ku "zimandî-rêjîyê" li ser terora dewletê dike, bê hişkirin matbee bîn girtin, feeliyetên sendîqayên karkiran bîn rawestandîn, grev bîn qedexekirin. Êşkere ye kutê-kiliya van hêz, kes û mueseşan bi terore tune ye, ew bi xwe bîne hedefa terora dewletê. Biryarda ku hatiye derxistin, navê wê kirine "qeramama terore". Çi navekî ku raste rast li terora faşîst a dewleta kolonyalist tê.

Ev "qeramama terore" ya ku hukumetê li dar xistiye, dide xwiya kirin ku dewleta Tirk dev ji siyaseta xwe ya berê ya înkarkirin û îmhakirina gelê Kurd bernedaye, di rojên pêşiyê de Kurdistan hê bêtir wê bibe hedefa êrîşên eskerî. Qeramama nû, xelkê sivilî jî dike hedefa hêzên dagirker yên leşkerî. Serokwezîrê kukla, êşkere îlan kir ku wê protestoyên zilmî, daxistina deriyê dikanan bi zor û tehdîdê bidin sekinandin. Ev dide xwiya kirin ku li Kurdistanê wê eşqîyatîyekê bê meşandin. Êşkere ye ku li Kurdistanê wê dewranekê sirgûna cemahîrî, qetlîam û girtinên gelêrî destpê bike, têkoşina karkir û zehmetkêşan wê bibe hedefa zorbeyî û qedexeyan. Ji bo ku rojname û kovar li hember buyeran çav û devê xwe bigrin hemû tedbîr hatin standin.

Ev tedbîrên nîjadperestî yên mîltarîst ne bes ji bo çarçeva Kurdistanê ne Di tevayîya Tirkîyê de têkoşina demokrasîyê, têkoşina zehmetkêşan a heq û edaletê û ya ji bo jiyanek baş a insanî jî dixin bin tehdîda xwe. Bi bahana pîrsa Kurdî û bahskirina wê, wê kovar û rojnamên sosyalîst, şoreşger û demokrat bîn girtin, sendîka, mueseşan insanî û komele bîn sekinandin, zindan bi şoreşger û welatparêzan bîn dagirtin. Wê qet ne ecêp be ku ev hemû bîn serê tevayîya

Tirkîyê.

Ev tedbîrên îdarî û eskerî ku dewleta Tirk li hember dawa milî ya adil a gelê Kurd anî, rastiyeke nîşanî gelên Tirkîyê û Kurdistanê, hêzên wan ên şoreşger û welatparêz dide: Li hember êrîşên azîrî yên dewletê tu fêde nîne ku ew perçemayî, belav û bîheng bimînin û hela hela paşde vekîşin. Ev wê pirtir cesaretê bide diktatorîya kolonyalist, tesîra êrîşkarîyê wê zêdetir bike. Çarek tenê heye, divê em muxalefeta gelên xwe, ji belavbûnê, bêrêxistinîyê xelasbikin, bi hêzek yekgirtî ya rêxistinî li hember dagirkerîyê, diktatoriyê û qetlîam, sûrgûn, zor û zulma wê li ber xwe bidin, ji vî yekê re bîjin "bes".

Ji bo ku li Kurdistanê qanûnên rewşa awarte û qeramamên terore rabin, ji bo ku ordî, tîmên taybetî û hêzên leşkerî yên din paşde vekîşin û çetecîtiya milîsî bê belavkirin û ji bo ku valakirina gundan, qetlîam û sirgûn bîn rawestandîn, gundî vegeirî ser erd û merayên xwe ku bi zorê jî wir hatine rakirin, ji bo ku hebûna mîletê Kurd; mafên wî yên milî û demokratîk bîn naskirin; ji bo ku hemû bendên îdarî û qanûnî yên li ber têkoşina demokrasîya Tirkîyê, têkoşina heq û azadiyê bîn rakirin divê em xwe bikin yek, têkoşinek tekûz a gelêrî ya rêxistinî bidin. Ji bilî vî rê tune.

TEVGER, bangî hemû partî, rêxistin û kesên Kurdîstanî yên şoreşger, pêşverû û welatparêz dike ku bi berpirsiyariya xwe rabin da em bibin yek û tevayîya mîlet bikişînin xeta têkoşina rêxistinî ya yekbûyî.

Îro, tu bahane nînin ku li hember êrîşên "mutabakata milî" ya hêzên burjuwazîyê metingehkar ên Tirk em xwe yek nekin û têkoşin nedin. Dijmînê me musterekek, armancên me, xwiya û xeteriya di wî mîletê me li hember e diyar e. Di wê riyê de ku wê vî xeterê berteraf bike û wê planên dijminê musterekek pûç bike û me nêzî armancên me nêzî xelasiya gel bike, divê em mil bidin hev û têkoşin bidin.

Divê em vî ala ku gelê Nisêbîn û Cizîrê û di pey re gelê herêmên din hildan bi rêxistinîyêkê hê firehtir û tekûztir li ba bikin. Platforma Demokratîk a Diyarbekirê û yên wek wê her çendî hê destpêk in û basît in jî didin xwiya kirin ku ji yekîtiyê çî qewet derdikeve. Li bajar û qezayên din ê welatê me, li rojava, li metropolan divê em nimûnên hê tekûz û pêşketîr ên wek platforma Diyarbakirê ava bikin, di vî wezîfê de dereng nemînin.

TEVGER, bangî gelê Tirkîyê; hêzên wî yên şoreşger, sosyalîst û welatparêz dike. Dawa biheq a gelê Kurd her wiha ya gelê Tirk e jî. Ew hêzên ku şerekî îlankirî li hember

Sîniyên me

Lawikê Berrivanî

Zarok ne lîstika me ne

Li Swêdê zarokên Kurdan jî wek hemû zarokên xerîba xwedî mafê xwendina bi zimanê diya xwe ne. Ev maf, ev îman jî bo me Kurdan pîr muhim e. Vîya alîkiyê meselê ye. Aliyê meselê yê din jî, gelo ev îman çawa tê bikaranîn û wek zanîn, wek ziman çî fêrî zarokan dibê? Çaxa ez wiha dibêjim qesda min ne ewe ku ezê jî alî "pedagojik" û "metodik" ve li ser hemû kitêb û materyalên ku di mekteban de bi zarokan tên xwendin, bisekinim. Na, nêteke min a wiha tune ye û jî xwe ev kar jî min bêtir karê alima ye. Di vî nivîsê de tiştê ku ezê bikim, ezê hin materyalên ku zarokên min wan bi kar tînin, di çerçewa vî quncikê de "histîrî" bikim. Li gel ku ez dizanim gelek hevalên mamoste wê bi van histîriyên min biêşin jî... lê çî heyf ku zarokên me jî pîr diêşin...

Di hemû materyalên ku di destê min de ne, tema wan a esasî û musterekek "gund" û "gundî" ye. Nizanim ev hevcedarî jî ku tê. Ez bawer nakim ku zarokên Kurd ên li Swêdê dijîn hemûyên wan gundî bin. Heta mumkûn e ku pîraniya wan di jiyana xwe de carekê jî gund nedîtîbin. Ya din, em dizanim ku Kurdistan bes ne "gund" e û Kurd jî hemû ne gundî ne; li Kurdistanê bajar jî hene. Divê nostaljiya jî welêt re dewsa ders û talîmê negrin.

Di van materyalan de, nuxta din a balkêş perîşaniya zimên e. Bira fêrbûna Kurdîyê rast li wir bimîne, ya xirabtir jî bo ku zarok çewto mewto bipeyvin, materyalên tên bikaranîn wek dermanê çavên kul in.

Meselen di "KOLIK Pirtûka Xebatê" de cumleyên wiha hene: "Dido min hene." Di nav cîyê vala de jî rismê du balonan hene. Netice, zarok wê navê balonê li cîyê vala bî-nivîse û wê çaxê jî wê cumle wiha bibe: "Dido balonê min hene." Her bi çewtiyek bi vî babetî cumleyek din: "Ez dido gêzer dibînim." (KOLIK, Ahmed Cantekî)

Di kitêba "Fêrbûna Zimanê Kurdî/Tipên Dengdar" de-ku nivîskarê wê jî Ahmed Cantekî e. - dibêje: "Bervajiyê peyvên ku li jêr in binivîsî ne!" û di binî de jî "Grover" û "Azad" hatine nivîsandin. Min û keça xwe, hey nikaribû bervajîya "Grover" û "Azad" tê derxista, lê ne me tenê, min jî çend mezinên din jî pîrsî, ya xerab wan jî nikaribû bereva jiya "Grover" û "Azad" bigotana. Divê ez bextê xwe navêjim, hinekan gelek "îhtîmal" rêz kirin û dû re jî gotin: "Mumkûn e ku jî vanan yek be..."

Di rûpeleke ku ji ber kitêbekê hatiye fêrîkirin (navê kitêbê ne diyar e, lê jî ber rûpela 45'ê hatiye girtin û li ser herfa "r" jî "kumîk" nehatiye bikaranîn.) de demên salê bi van numûnên jêrin bi zarokan tên fêrîkirin:

"Biher, mîh û bizîn kar û berx, hesp û ker li ser mêrgên kesekê dîçerîn."

Tu dibêjî qey li dinyayê numûneyek din nema, her were, wê biher bi "ker" û "hespê" bî fêrîkirin... Ya din jî, heywan "li ser mêrgê" naçêre, di mêrgê de diçêre û mêrg jî ne "kesek" e.

Em werin havînê. Gotîye, "Havîn germ e." Viya qebûl. Lê mesela hatiye gotin ku, "Havîn bi bîhn û bereket e." qet neket serê min. Em bibêjin ku em mîletê Musilman in û emê gotina "bereket" ê ji zarokên xwe re îzah bikin, lê mesela "bîhnê"?

Ev jî payz e:

"Payiz, li mêrgan giya tî çînî (...)" Gundi sawar û ardê xwe dikin cî (qey berê ne di cî de ye), giya û êzêngên xwe kom dikin, dikin lod "Ew kesê ku van rêzên jor nivîsandiye li gel ku qala gund dike," di esasê xwe de ew gund û jiyana gund qet nizane. Çimkî berî her tiştî ne mumkûn e ku "giya mêrgan"

Dûmahîk: r. 11

Lêkolîn

Sala 1989'an, li Moskova ji alî Çapxana "Naûka" (Zanistî) pirtûka **M. S. Lazarev** ya bi navê (Împeryalîzm û Pirsî Kurdî) belav bû. Ev pirtûk berde-wama pirtûka wî ya "Pirsî Kurdî" ye ku ew di wê de li ser qonaxa dawîya sedsala XIX'an û destpêka sedsala XX'an (1890-1917) disekine.

M. S. Lazarev di xebata xwe ya nuh de, bi firehî li ser dîroka hemû perçên Kurdistanê, ya qonaxa salên 1917-1923'an disekine. Ew bi awakî objektîvî şikestin û serkevtinên tevgera rizgariya Kurdî ya wê demê pêşkêşî me dike. Li gora meteryalên ku wî bi kar anîne, xweş tê xwiyakirin ku Kurd ne tenê ji ber netê-gihîştina xwe û dûrnedîtina serokên xwe, her wiha jî ji ber listikên dewletên Împeryalîst (bi taybetî Îngilîz û Fransa) ji mafên xwe bê par man.

Li gel ku navê Kurd, car-car bi nav dibe jî lê nuha di nav lingan de diçe, lê pirsî wî, wek Lazarev di pêşgotina xwe de dinivîse, problema Kurdî dawîya sedsala XIX'an dakete meydanê û heya roja me dij-wariya xwe wînda nekiriye. Di bingeha vê pirsê de, xebata rizgariya gelê Kurd ê bindest heye. Ev xebat geh tîk çû û geh bi ser ket, lê tu carî nehate rawestandî. Erê Kurdan serkevtinek bi temametî, ji perçakêkî ji perçên Kurdistanê bi destê xwe nexistine, lê neyarên wan jî hîç nikaribûne agirê serîhildanên wan vemirînin.

Wek Lazarev dinivîse, pirsî Kurdî, di çerçewa pêşketina xwe ya dîrokî de, di çend qonaxan re derbas bûye. Çerçewa wê ya zemanî, ji aliyekî, li gora prosesên civakî, aborî, siyasî û îdeolojî, çî li Kurdistanê bi xwe û çî li welatên ku Kurd lê dijîn, tê sinor kirin û ji aliyê din ve, ew bi guhertinên teşkilên civakî li hemû cihanê (bi taybetî ew welatên ku li Rojhilata Navîn û Nêzîk xwedî berciwendîbûn) girêdayî ye. Bi xwe ev guhertin bûn sedemên pêwendiyên nuh di nav netew û dewletan de.

Li gora van pîvanan, pirsî Kurdî ji roja pêydabûna xwe di sê qonaxan re derbas bûye û nuha jî di qonaxa çaran de ye.

Qonaxa yekem, di salên 80'ê ya sedsala XIX'an de diqede. Pêydebûna pirsî Kurdî bi lawaziya Împaratoriya Osmanî û Şahînsahiya Îranî ve girêdayî ye. Vê prosesa dîrokî li herêmê hişt ev dewletên paşvemayî serxwebûna xwe wînda bikin û ji dewletên Împeryalîzmê re bibin nivkolonî. Bi xwe munafesa li ser "menatiqê nifûzê" hişt dubendî di navbera Rûsya, Îngiltere û Franse de gurr bibe. Di vê munafesê de, axa

Kurdan li Rojhilata Anadolê, Bakurê Iraqê û Rojavayê Îranê girîngiyek stratejî stand. Kurdan jî dest birin xwe û dan ser rîya xebata rizgariyê li dijî stemkariya Sultanên Tirkî û Şahînsahên Îraniyan, gava ku bi lawaziya desthilata navendî xistin.

Serîhildanên Kurdan wê demê bi qerekerên xwe feodalî bûn. Ew jî rengvedana civaka Kurdî ya paşvemayî ya wê heyamê bûn.

Qonaxa duyem, bi nêrîna Lazarev, salên 80 û 90'î ji sedsala bihûrî dide ber xwe. Ew vê qonaxê bi faktorên guhertinên ji derve û ji yê hundir ve girê dide. Ew dibêje ku, di vê pêlê de sermiyandariya cihanê derbasî merhela Împeryalîzmê bû. Bi xwe vî tiştî hişt ku guhertinên cewherî li Roj-

piştî Şerê Cihanê yê Yekem, Kurd ji xwe re kirin qoz. Û ji bo tozê bixin çavan, Îngî-lîstanê şîra serxwebûna Kurdistanê bi awakî resmî bilind kir. Bi xwe ev qonax, ji bo xwenasîn û Kurdayetiyê, ya herî berbiçav e.

Qonaxa çarem, piştî Şerê Cihanê yê Duyem dest pê dike û heya roja me berdewam e. Piştî Şerê Cihanê yê Duyem, her hêzekê li gora îmkânên xwe ciyê xwe li meydana cihanê girt. Rewşa nuh li cihanê tesîra xwe li rewşa Kurdistanê û pirsî Kurdî jî kir.

Şikênandina Almanya Faşîst û ji aliyekî hêzên pêşverû, çî li Ewropa û çî li welatê Rojhilata Navîn, xurt û geş kir û ji rexê din ve dewletên

M. S. Lazarev dibêje; qonaxa dawîya sedsala XIX'an destpêka sedsala XX'an ji çaralî, ji rexê Kurdnasên Sovyetî (wek Xalfîn, Celîlê Celîl û Lazarev bi xwe) hatiye derskirin lêbelê qonaxa din ji dîroka gelê Kurd a ku pirtûka Lazarev li ser dipeyive, hîn nehatiye derskirin. Xwediyê kitêbê bi xwe dibêje, nayê wê manê ku materiyalên dîrokî, li ser wê qonaxê kê in an nînin. Na. Di wê heyamê de, li ser bûyarên demê roj bi roj di rojname û kovaran de, çî bi awayê nûçan û çî bi awakî lêkolîn, nivîs belav dibûn. Bi xwe ji ber ku nivîs di wextê de belav dibûn, pirê caran diketin bin tesîra sî an bayê siyasî û forma xwe ya objektîv wînda dikirin û zirar digihandin rastiya faktan. Dûre jî piştî bûyarên wan salan,

Lazarev dinivîse, arşîva Hindî bi materyalên xwe yê li ser Kurdan a herî dewlemend û pîr e.

Lazarev dibêje ku ji bo pirtûka xwe bîranên şexsên navdar ên cihanê (wek Loyd Corc, Churchill, Duan Kore, Hauz û yê din) bi kar anîye. Ji pressên Xerbi yê ku ji wan hatiye feyde kirin ev in; kovara Îngilîzî "Near east end India" (vê kovarê çend caran navê xwe guhartiye), kovara Fransî "Korrespondans d' Oriat" û kovara Îtalî "Orient Moderno". Her wiha ji pressa Sovyetî ya heyamê salên 20'an jî, ji bo pirtûka "Împeryalîzm û Pirsî Kurdî" bûne jêder. Lêbelê Lazarev dibêje ku, mixabin ne hemû nivîs bi awakî ilmî hatine nivîsandin. Ji ber ku pirê caran bêmane û bîmane "pêçîka" Împeryalîzma Îngilîz û destdirê jiya wê di tevgera Kurdî de diditin. Bi xwe nivîsên wê demê tesîrek negatîv li lêkolînên salên 40'î kir.

Lazarev di dawîya pêşgotina xwe de dinivîse; "ez nabêjim ku wê xebata min ne békêmasî be. Lê çawa be, ew niha di destê xwendevanan de ye û hukmê dawî yê wan e."

Pirtûka Lazarev "Împeryalîzm û Pirsî Kurdî" ji van beşan pêk hatiye:

Beşê yekem: Kurdistan li ber dema nuh

▲ Îşxalkirina Kurdistanê Bakur û Rojava ji alî Tirkîyê ve.

▲ Siyaseta Îngilîz li hember Kurdan di dawîya Şerê Cihanê yê Yekem de

▲ "Faktorên Rûsî"
Beşê duyem: Amedekirina pûçkirina Kurdistanê careke din

▲ Plan û amedekirina Îngilîz li Kurdistanê Bakur

▲ Di eniya dîplomasiyê de
Beşê sîyem: Tevgera Kurdî di salên 1918-1920'an de

▲ Serîhildana Şêx Mahmûdê Berzencî ya pêşî

▲ Serîhildanên din li Kurdistanê Başûr

▲ Projektên Îngilîzan
▲ Simko

▲ Nasyonalîzma Kurdî li Tirkîyê û siyaseta Îngilîzan

▲ Tevgera Kurd û Kemalîzm
Beşê çarem: Rê ber bi Sewirê ve

▲ Pirsî Kurdî li Konferansa Parisê ya Aştiyê

▲ Mewqîfê Amerika
▲ Gîftêgoyên Îngilîz bi Franse re

▲ Konferansa San- Remo
s Siyaseta Îngilîz li hember Kurdanê

Beşê pêncem: Sewr û encamên wê

▲ Sewr

▲ Li Konferansa Qahirê
▲ Rewşa Kurdistanê Iraqê

▲ Tevgera Kurd li cihanê
▲ Gerra li Kurdistanê Tirkîyê û Sûriyê

Beşê şeşem: Konferansa Londrayê (Sibat-Adar 1921'an)

▲ Ber bi Lozanê ve

▲ Pirsî Mûsil û ya Kurdî li Konferansa Lozanê

Împeryalîzm û Pirsî Kurdî (1917-1923)

hilata Navîn çê bibin. Bi rewşa xwe ya niv-kolonî Împaratoriya Osmanî û Îranî hîn bêtir li ber dewletên Ewropî hatin çewisandin û hustixwarkirin. Hejmarî talankeran li wan pirtir bû, ji bilî Almanya û Îtaliya, Amerika jî destê xwe xist nav wan.

Bi vî hawayî haziriya lihevpar kirina herêmê, di nav van dewletan de temam bû. Bi awakî emelî Rûsya û Îngilîstanê dest bi perçekirina Îranê di nav xwe de kirin. Lê di eynî wextê de, li ser bingehê prosesên aborî, siyasî û îdeolojî û di bin tesîra bûyarên şoreşgerî de yê li Rûsya, li hundirê Tirkîyê û Îranê hêzên hemberî Împeryalîzmê hatin meydanê. Bi xwe ev dem ji bo tevgera rizgarîxwaziya Kurdî, dema gavavêtina pêşî bû. Kurd jî ketin meydana siyasî û armanca xwe ji bo avakirina dewleta xwe li ser axa Kurdistanê, belû kirin.

Qonaxa sêyem, piştî Şoreşa Oktobê û Şerê Cihanê yê Yekem tê. Bi xwe li vira kiriza sîsetma kolonyalî ya Împeryalîzmê dest pê dike. Lazarev dibêje diyardeyên (zahîrên) kirîzê li welatên Rojhilata Navîn û Nêzîk diyar bûn û helbet vê zahîrê li Kurdistanê jî serê xwe rakir. Li gel ku gelên cî li ber xwe dan jî, lêbelê dewletên Împeryalîst lingên xwe xweş li herêmê girtin.

Em pê dizanin ku para Îngilîz ji herêmê, ya şer bû. Bi taybetî

Împeryalîst, bi taybetî Amerika, li herêmê xwe bêtir aktîv kirin. Ji ber vî çendî, Rojhilata Navîn bû meydana yekemî ji bo dubendiya navnetewî. Bi xwe vî tiştî hişt ku rewşa Kurdan aloz û barê wan girantir bibe. Çimkî li hemberî wan du hêzên hevalbend Împeryalîzm û kevneperestên herêmî rawestiyên. Û li gel ku tevgera Kurdî bi awakî giştî, piştî Şerê Cihanê yê Duyem, çerçewa burjuwaziyê milî şikand û derbasî qonaxek bilind bû, lêbelê di xebata xwe ya adil de, serkevtinek bi temametî bi dest nexist. Hîn ew neqebên ciddî, çî yê hundirê civaka Kurdî û çî yê derve, nehatine rastkirin.

Di nêrîna M. S. Lazarev de, qonaxa dawî ya serdema me, perçeyî çend pêpelûkan dibe,

1- Ji sala 1945'an heta sala 1958'an

2- Ji sala 1958'an heta sala 1975'an

3- Ji sala 1975'an heta heyama me.

Wekî Lazarev dinivîse, ji qonaxan a ku rolek girîng di dîroka tevgera rizgarîxwaz a Kurd lîstiyê, ew qonax e ku piştî Şoreşa Oktobê dest pê kiriye û heya sala 1923'an dirêj kiriye. Bi xwe ew bi domkirina wextê ne pîr dirêj bû, lêbelê bi bûyarên pîr dagirtî bû. (Em pê dizanin ku di wê demê de Peymana Sewr û Lozanê hatibûn îmzekirin)

tiştêkî nehate nivîsandin. Ne dîr e, ew jî ji ber bêdengîya ku xwe di salên 30'î de berdabû ser tevgera Kurdî, tê. Bi gotinek din, pêla ku pirsî Kurdistanê serbixwe ji rojava siyaseta navnetewî hate hilandin. Vê rewşê heya salên 50'î dom kir, lê jê pê ve, pirsî Kurdî li gora dema xwe serê xwe bilind kir û her sal bi wir de diçûn, wê, xwe di nav gelê cihanê de, bêtir da naskirin û ji berê bêtir jî li ser hate nivîsandin.

Herçî çavkaniyên materyalên pirtûka "Împeryalîzm û Pirsî Kurdî", xwediyê wê ji gelek jêderan daye hev. (Bi xwe yek ji karakterên hêja ji lêkolînên Lazarev, meteryalên pîr û rengo-rengo ne) Li gora ku Lazarev dinivîse; arşîva Hindî ya Netewî, ji bo pirtûka wî wek çavkaniya herî bi ber bû. Fonda vê arşîvê bi awayî mîkrofilmman di arşîva Rûsya ya Siyaseta Derve de, li Moskova tê parastin. Dokumentên vê arşîvê orjînal in, heqîqî ne û ji destê yekem in. Ew li ser dîroka siyaseta Bîrîtanya kolonyalî li hemû herêmên Rojhilata Navîn e. Bi xwe meteryal ew in ên ku seraser ji Rojhilata Navîn ji vise-qîratê Bîrîtaniyê li Hindîstanê dihatin hinartin. Her wiha jî ew nûçe û nêrînen li ser Kurdistanê ku jê re ji Londonê dihatin şandin, bûn. Li gora ku

**Amadekar:
Bavê Nazê**

Nasir Rezazî:

"Muzîk Zimanê Hest û Atfê Mirov e"

Dengbêjê bi nav û deng Nasir Rezazî, ji Kurdistanê Iranê ye. Di sala 1955'an de li bajarê Sine hat dinê. Di sala 1979'an de ew û xanîma xwe bi hev re bûn pêşmerge. Heta 1985'a; hatina wan ya Swêd li çiya di nav refên pêşmergeyan de bûn. Heval Z. Xamo li ser muzîk û gelsên dengbêjên Kurd pê re peyivî. Bi hêviya ku hûnê ji ji hevpeyvîne hez bikin.

Armanç: Ez dixwazim vê hevpeyvîne bi pirseke hi-nek klasîk dest pê bikim; çi bû sebeb, çi tesîr li te kir ku te senetê dengbêjiyê ji xwe re kir kar?

Nasir Rezazî: Ez dikarim bibêjim ku tesîra çend tiştan li min bû. Yek cewh û tebieta Kurdistanê; wek çiya, kanî, cobar, daristan û tiştên din...dudu, urf û adet, rism û rusûmê Kurde-wariyê bi tevayî... Lê ji hemûyan girîngtir, di mal-bata me de kesên dengxweş pîrr in. Mesela diya min, bavê min, apê min; ku deng-gê min ji bi dengê apê min dimîne. Min bi xwe ji ji stranên pîrr hez dikir, çend caran di cimatan de, di şahî û dawetan de min stra. Û ev ji bû sebeb ku xelk, min teşwîq bike û ew teşwîq û hezkirina xelkê bû sebeb ku ez qîmetê bidim stranbêjiyê û ez bibim dengbêj.

Armanç: Muzîk ji bo te çiyê?

N. Rezazî: Eger em bixwazin bi zanistî bahsa muzîkê bikin, dibê em bibêjin muzîk texzî ye, ya ji xurakê canê insan e, muzîk nişana bîzar û jiyane ye. Muzîk zimanê hest û atfê mirov e. Muzîk ji ciwanî û mirovatiyê dipeyve. Lê ji hemû tiştî girîngtir, muzîk têkoşîneke insanî ye. Ji bo min muzîk bêyî van hemû tarîfan bi tenê ne xweşî û lezet e. Çimkî ji bo danû-stendin û îribata di navbera insanan de wesîle, ya ji malzeme ye. Piştî ku wi-haye, divê muzîk di xizmeta insan û insanîyê de be. Muzîk, ewe ku divê di mirov de agir dayisî ne, yanî agir bi mirov xe.

Armanç: Gel ji dengê te pîrr hez dike, di şevan de guhdar naxwazin tu ji sahnê dakevî. Gelo çavkaniya muzîka te çiyê?

N. Rezazî: Ez dixwazim vê pirsîyarê bikim du beş. Beşê yekem; li Kurdistanê stranên geleri û folklorîk pîrr in; hewqas stran hene ku heger her dengbêjê Kurd bikaribe wan bi kar bîne û bistrê cardin ji tem-am nabe. Dr. Îzeddîn Mustafa Resûl di pirtûka xwe ya di derbareyî folklorê de dibêje: "Rojhilatnasê mezin yê Ermenî Ebû Viyan ku di sedsala XIX'an de wek r o ş e n b î r û pêşkewtîxwazekî Rojhilat

hatiye naskirin dibêje: "Her Kurdek bi serê xwe Pîremêrd e, nexwenda be ji cardin ruhê şairîyê bi wan re heye, gîşên wan di warê stranbêjiyê de xwedî gotin in, pîrr bi hêsani li ser xwe strana dibêjin, bi dol, bi çiya, bi tavge, bi rûbar, bi gul, bi çek, bi hesp, bi azadî, bi ciwanîyê û pîrr tiştên din..."

Mar, ku ew ji zana û zimanzanekî mezin ê Rojhilatnas ê Sovyet e dibêje: "Folklorê Kurdî ne bi tenê di nav Kurdan de, her wisa di nav gelê din de ji wek Erebi, Farisî, Azerbeycanî, Ermenî û Asûriyan de ji heye. Û Minorskî jî dibêje: "Li ba wan Asûriyên ku li çiyên dijîn stran, çîrok û gotinên Kurdî nuha ji hene û bûye adeteke gîştî. Û mebesta min ew bû ku folklorê Kurdî pîrr dewlemend û firawan e. Û ji çavkaniyên muzîka min yek ji folklorê Kurdî ye, ku bahsa ciwanî û tebieta Kurdistanê dike.

Dudu, ez tîm beşekî din yê vê çavkaniyê: beşê din, komar an civaka îro ya Kurdistanê ne wek a caran e, di hemû warî de ferq kiriye. Muzîk ji ku ji gel nefsiyet û ruhê meriv ser û karê wê heye, dan û stendina wê heye, pêwîstiyê civakî ye û li gor geshbûna civakê Kurdî, ew ji bi pêşketiye. Cihana îro cihana sermayedari ye, yan kapitalistî ye, mîletên bindest pîrr in. Mesela sermaye cihanê, yan rewşa sermaye-nê cihanî pîrr tiştên wekî Helepçe dixuliqîne yan çê dike. Ne beranberî zulm û zor, tebdîzen nijadî û mezhebî, ferq û fahşa birçî-tiyê, vana hemû ji bo hunermendê şiyar û agah çavkanî ne. Beşê din di çavkaniyên min de ev tişt in ku min bahs kir. Piştî wê bindestbûn û perçe perçebûna Kurdistan û mîletê Kurd e. Vana hemû ji bo min çavkanî ne û ez berhemên xwe ji van çavkaniyan digrim.

Armanç: Tu dengbêj û şairê ku li hunerê te tesîr kiribin hene gelo?

N. Rezazî: Min berê bi sitranên geleri yê navçaya Sine dest pê kir. Piştî wê, bere bere hatim ser stranbêjên Kurd yan ji hatim ser rîya sitranbêjên Kurd; wekî Mihemed Mamlî, Hesen



Nasir rezazî di şevê Newrozê de

Zîrek, Tahîr Tewfîq û Elî Merdan. Yanî min ji van sitranbêjên Kurd tecrûbeyek girt. Ku nuha ji ez dikarim bibêjim ku min rîyeke taybetî ji bo xwe hîlbijartîye. Û ji şairên Kurd jî, zêdetir min şîrên mamoste Goran û mamoste Hêmin di stranên xwe de bi kar aniyê. Piştî wê ji min pîrr şîrên folklorîk ên kevn di sitranên xwe de bi kar aniyê. Û min bi xwe ji ji bo sitranê şîr nivîsandîye. Û ew sitranbêjên Kurd ên siyasî ku heta reddeyekê li min tesîr kirine mamoste Tahîr Tewfîq û mamoste Salih Dilan e. Wan li gel sitranên geleri, sitranên siyasî, şoreşgerî ji gotine.

Armanç: Baş e, çaxa tu muzîka xwe çê dikî, tu ji çi îlhâmê digrî, yan ji di bin tesîra atmosfereke çawa de dimîni?

N. Rezazî: Wek melodi ez zêdetir ji sitranên Kurdî îlhâmê digrim, li ser bîngeha wan sitranên nuh çê dikim, naçim ser sitranên Tirkî, Erebi ya Farisî. Çimkî muzîka Erebi tesîrek mezin li muzîka Kurdî

kiriye. Her wisa li ya Tirkî û Farisî jî. Lê ji bo sitranên şoreşgerî, min berê ji bahs kir, pîrr proje hene ku meriv dikare li ser wan sitranan çê bike. Lê ew ne tenê karê sitranbêj e, divê şair jî alikariyê bike. Meselen, li ser qetliamên li Kurdistanê dibin meriv dikare şîr binivîse û di dîrê jî bike sitran.

Armanç: Ji hemû perçên Kurdistanê Kurd li Ewropayê dijîn. Ji bo dengbêj û hunermendên Kurd ev imkane baş e. Lê li alî din em dizanin ku Kurd hemû bi yek lehçê Kurdî napeyivin. Lema ji ew dengbêjên ku bi yek lehça Kurdî distirên hemûyên Kurdan bi hawakî baş ji muzîka wan tê-nagihîjin. Wek hunermendekî Kurd dîtina te li ser vê gelsê çiyê?

N. Rezazî: Her kes dizane ku zîmanê Kurdî zimane-ke pîrr dewlemend e û xwediyê çend zarava ye, wekî Kurmancîya serû, Kurmancîya xwarû(Soranî), Hewramî, Zazakî û Kelhurî. Lê nuha li Kurdistanê du diyalekt zîmanê xwendin û nivîsinî ye; yek Kurmancîya serû, dudû, Kur-

mancîya xwarû û her yek ji ji bo xwe zaravê nivîsin û edebiyatê ye. Û kes jî nikare van her du zaravan bike yek. Ji bo vê yekê pîrr hewl û têkoşin heye, lê tiştê xeyalî ye, nabe. Û rast e, yekî Kurmancî bi hawakî baş ji sitranbêjê Soran fahm nake, û her wisa yekî Soranî bi temami ji sitranên Kurmancî fahm nake. Bi dîtina min hemû sitranbêjên Kurd, çi Soran, çi Kurmancî û ci ew kesên ku bi Zazakî û Hewremanî distirên, ger bikaribin bi her çar diyalektan jî bistrên karekî pîrr baş e, lê ev tiştê sext e. Çimkî bi tenê ew ne pêwîst e ku ji te re sitranên Kurmancî binivîse û tu rûnî û ew hazir bike û tu bixwinî. Meselen, ez wek sitranbêjê Soran lazim e ku li gel sitranbêjên Kurmancî tîkiliya min hebe, bikaribim bi diyalektê Kurmancî jî binivîsinim û bixwinim. Wê çaxê dikarim sitranên Kurmancî jî bibêjim. Bi rastî folklorê Kurmancî pîrr pîrr dewlemend e û xwediyê gelek sitranên Kurdî ye. Ez, ev demeke li derî welat dixebitim ku vî karî bikim û

HEVPEYVÎN HEVP

min hin sitranên Kurmancî jî hazir kiriye. Çimkî jî bo me her Kurdekî diyalekt nabe ferqeke pirr girîng. Eger tîkiliyên me hebe, meselen eger Kurdistan yek buya ev problem jî hel dibû. Nuha li derî welat piçek baştir e; li gor hundur. Mesele, di navbera Kurdên Îran û Tirkîyê de eleqet tune ye, danûstendina wan tune ye, wê ev her du beş bi başî çawa jî zîmanê hev û du fahm bikin. Lê wexta kontakt hebe, nêzikayî hebe ev mesele jî hel dibe. Wek min got, jî ber ku li hundir tîkiliyê tune ye loma zaravayê hev fêr nabin, lê li derva jî ber ku tîkiliyê heye, pirr kes hene ku Soranî fêr bûne û pirr kes jî hene ku Kurmancî fêr bûne. Min jî nuha hin sitranên Kurmancî hazir kirine, dixwazim wan di kaseteke nuh de, ku nuha ez pê mujûl im, bixwînim. Bi dîtina min karekî pirr baş e, Kurd her Kurd e, diyalekt ne ferqek hewqas mezin û esasi ye.

Her wisa ez hez dikim gava ku ez sitranên Kurmancî dibêjim, ne bi tenê li ser ciwanî, folklor û tebîeta Kurdistanê bibêjim, lê li ser wan bûyer û karaset û serhevdeyên ku li welat hene, bahs bikim, ew baştir e. Û her sitranbêjê Kurmancî jî dema ku bixwaze sitranên Soranî bibêje her ev rewş e, bi dîtina min.

Armanç: Tu jî wek gelek hunermendên Kurd nuha li dervayî welat dijî. Başî û nebaşîya ve jiyana surgûniyê, çi tesîrê li sen'et û xebata te dike?

N. Rezazî: Min karê xwe yê hunerî li meydana li dijî sitema zulm û zorê, li welat dest pê kiriye; ne li dervayî welat. Yanî ez li welat bûm sitranbêj. Û ev hel û merc tiştêkî xoza ye seranserê tîkoşîna hunerî ya min a di dirêjtiyaya van çend salan de ku têper bûye, bi mêjû û civaka Kurdewarî ve girêdayîye. Di wî warî de ez dikarim bibêjim ku durbûna jî Kurdistanê hiç tiştêkî jî hest û sozê min ên beramber bi gelê min kêm nekiriye, neaniye xwarê. Çimkî bi vî ve girêdayî dikarim bibêjim ku hestê min pirr bi leztir, pirr bi agirtir bûye. Rast e ez ne li Kurdistanê me, jî wê waqîê dîr im, lê ew qetliam û bûyerên ku li Kurdistanê dibin, li min tesîrê dîkin. Lê li alî din danûstendina min bi Kurdistanê û bi pêşmerge re heye. Û ev tîkoşîna danûstendin tesîrê li ser karê min e hunerî dike. Kêm û kurri jî heye, bes çare tune ye, merivê çi bike! Û jî wexta ku ez hatime Swêd û virde berî her tiştî tîkoşîna, hewl û tîkiliya min ew bûye ku ew sitranên ku min li Kurdistanê sitrabûn ku li ser zarê xelkê Kurd

wekî berhemeke nuh ci girtine, careke din ez wan bi rîk û pêktir dixim kasetan. Çimkî piraniya wan, wexta li çiya bûm hatin tomarkirin, imkanên teknîkî tunebûn. Diyar e di vî riyê de min gelek gir û girift hiştiye, gelek kêm û kurri hatiye ser rîya min. Piştî wê jî ez dixwazim berhemên nuh bi awayekî baştir û bi rîk û pêktir bîn ser kasê. Lê mixabin problem pirr in; him jî alî maddî û him jî alî hêzên insani. Tenê jî bo numûne, muzikarê Kurd hene, bes her yek li welatekî ne û komkirina wan pirr zahmet e. Disa di ser van hemû gir û giriftan de ez dixebi-

xwe de wexta Zerdeşt Pêxemberê Kurda bûye û Kurd jî agirgehên wan hebûne û xelkê jî li dora wî agirî xezel gotin e. Helbet ne hemûyê xelkê, kesên dengbêj bûne ya jî ew kesên dengên wan xweş bûne li dora wî agirî xezel gotine. Û dibêjin ev "heyran" jî wê çaxê de maye heta nuha. Û esas jî beyt heye, beyt dagirê him "Lawik" e him "Heyran" e. Lawik tiştêkî hemaşî ye û heyran ne hemaşî ye. Di Lawik de pirr tiştên kevn, pirr bûyerên kevn tîkoşîna. Mesele, Kawis Axa bahsa Şêx Mahmûd dike, Arîfê Cizîrî Eysana Eli bi lawik dibêje. Sitranbêj nikare wana bi

Kurdî kirine Farisî. Mesela li Sine û bajarên din ev kar kirine. Ji bo numûne "def", def li Kurdistanê Îran instrumentekî Kurdî ye, koka wê jî islam û ji mezhebê islamê tê, bes piştî wî ev defa derwêşî li nav Kurdan resm e. Lê jî alî muzikalên Sineyî ve çûye nav muzîka Farisî, nuha Faris ve defê bi kar tînin. Reng e ku di dahatû de jî wê nebêjin ku ew muzîka Kurdî ye, hatiye nav muzîka Farisî. Û pirr ritmên din hene di muzîka Kurdî de ku ew kirine muzîka Farisî, ev jî aliyekî din e. Yanî ew tiştên bi qestî dibin, ji mesela istifade-kirina jî kultura miletekî din gelek ci-

Ji ber wê jî nabêjim Tirkîye, çimkî li Tirkîyê Kurd hiç di tu mafekî kulturî de ne beşdar in. Meselen li Kurdistanê Iraqê pirr grûbên Kurdî hatine çekirin di nav van sî salan de grûbên Kurdî hatine çekirin û pirr sitranên Kurdî pêşkêş kirine. Lê ev karê wan, meriv nikare bibêje ku muzîka Kurdî jî qonaxekê birine qonaxeke din; na, li Îranê jî ev kar bûye, lê problemên me ewe ku rê nadin em karên xwe bi başî bikin, her karekî me di nîvî de maye û lîxistin e.

Armanç: Ji kesên ku bi muzîkê ve mujûl in tu dixwazî tiştêkî bibêji gelo?

N. Rezazî: Ez nabêjim ku ez li muzîka Kurdî bi başî şareze me, ez jî sitranbêjê Kurd im. Lê li gor tercuba xwe ez dibêjim sitranbêjên Kurd pêwîst e ku bi edebiyata Kurdî bizanibe; ne bi tenê Soranî yan Kurmancî, eger bi hemû zaravayên Kurdî bizanibe baştir e. Çimkî sitranbêj pêwîst e ku bizanibe şîrên Kurdî hîlbijêre jî bo sitrana xwe. Çimkî wek min bahs kir civata Kurd nuha ne wek berê ye, pirr tişt bi ser me de hatiye, pirr girîng e ku sitranbêjên Kurd ên ku şîrên ji bo sitranên xwe çê dikin eger bikaribe bi jiyana, tîkoşîna û xebata îro re bibe yek baştir e. Piştî wî jî hewl bide ku sitranên Kurdî bibêje. Û ew sitranê ku jî alî wan ve te gotin divê ne tenê folklorîk bin, divê li ser tiştên nuh jî bibêjin. Helbet dema ez dibêjim sitranên Kurdî jî ber ew hel û merc bar û dox û rewşa ku nuha li Kurdistanê heye, heqê me sitranbêjê Kurd e ku sitranên Kurdî bibêjin û nehî-lin sitranên Kurdî bi destê dagirkerên Kurd bîn guherandin. Û mixabin ez nikarim bi zîmanê din sitran bibêjim, eger pirr hez nekim jî bi Tirkî, bi Erebî, bi Farisî dema sitrana bibêjim, bes çi sitran... ew sitrana ku bahsa Kurdî bike, ew sitrana ku bikaribe Kurda binasine bi miletekî din, ew sitrana ku bikaribe deng û hawar û bangewazê gelê Kurd bigihîne cihanê. Lê ez jî alî muzîkê ve nikarim tiştêkî bibêjim, ez bi tenê sitranbêj "dengxweşekî Kurd im. Geşkirin û pêşxistina muzîk û sitrana Kurdî bi tenê ne karê sitranbêj e, belku pêwîst e muzikvanên Kurd, sitranbêjên Kurd û şairên Kurd bi hev re wî karî bigrin hûstiyên xwe û pêşketin û pêşveçûna muzîka Kurdî li ser şanê wan sê beşan disekine.

Û di dawî de jî gelek sipasî rojnama Armanç û te dikim. Hêvîdar im her bîminin jî bo xizmeta bi zîman û edebiyata Kurdî re, her bîjin!

Eger em bixwazin bi zanistî bahsa muzîkê bikin, dibê em bibêjin muzîk texzî ye, ya jî xurakê canê insan e, muzîk nişana bizav û jiyana ye. Muzîk zîmanê hest û atfê mirov e. Muzîk jî ciwanî û mirovatiyê dipeyive. Lê jî hemû tiştî girîngtir, muzîk tîkoşîneke insani ye. Ji bo min muzîk bîyî van hemû tarîfan bi tenê ne xweşî û lezet e. Çimkî jî bo danûstendin û îrîbata di navbera insanan de wesîle, ya jî malzeme ye. Piştî ku wihaye, divê muzîk di xizmeta insan û insaniyete de be. Muzîk, ewe ku divê di mirov de agir dayîsî ne, yanî agir bi mirov xez

tim her jî bo karê hin baştir.

Armanç: Di muzîka te de xezel ciyekî muhîm digre. Gelo ev meqam, maqamekî Kurdî ye ya na?

N. Rezazî: Berî vî pêwîst e ku bibêjim, ev meqam di Erebî, Farisî, Azerî, Asûrî û Ermenî de jî heye. Lê eslê meqam meriv nikare bibêje ku Kurdî ye ya Erebî ye. Meselen, dezgehek, yan meqamek bi şûr yan bi beyat Kurdek bi Kurdî distirê, Erebek bi Erebî distirê, Tirkêk jî bi Tirkî distirê. Ev gotin e, gotin. Yanî tabî yan jî şewazek e ku ew meqama dike Kurdi yan Erebî, yan Tirkî. Piştî wê jî problemekî din heye. Meselen şairên me îro şîrên klasik nabêjin, şîrên nuh dibêjin. Şîrên nuh jî jî bo sitranê nabe, yanî tu nikarî şîrê nuh bikî sitran weke sitranên kevn ku di Kurdî de hene. Tu naçarî ku van şîrên nuh jî ber hundir, yan naveroka wan bi meqam bistirê. Û ew meqamê ku ez distirê min zêdetir tîkoşaye ku wekî, meselen "Lawik", "Heyran" an ew meqamên ku di Kurdî de hene bistirê. Û jî ber wê jî zêdetir xezel dibêjim. Piştî vî jî, xezel di Kurdî de ciyê wê pirr kevn e. Yanî zorba û piraniya sitranbêjên me xezel gotine û dibêjin û sitranbêjê ku bikaribe xezel bibêje baştir alikariya wî dike, yan baştir e jî boyî wî.

Her wek ku min bahs kir ku xezel di Kurdî de ciyekî wê yê pirr kevn heye. Esasî mezhebiya wê jî heye. Meselen pirr kevn di wexta

sitran bibêje. Û jî ber wê ye ku pirr bûyer û karesat hene ku meriv nikare wan bi sitran bibêje, mecbûr e bi xezel bibêje. Û berî xezel jî "gat" hebûye. Di wextê xwe de ku Kurd agirperest bûne her yek li ser dîn û mezhebêkî bûne "gat" hatiye xwendin, nuha nemaye.

Armanç: Wek tu jî dizanî li Kurdistanê Tirkîyê gelek dengbêjên Kurd hene ku muzîka Kurdî bi gotinê Tirkî di-bêjin. Gelo li Kurdistanê Îranê rewş çawa ye?

Bersiv: Pêwîst e ku em li tiştêkî binêrin. Li Kurdistanê Tirkîyê Kurd nikarin jî kultura xwe istifade bikin. Çimkî her tiştên Kurdî li Kurdistanê Tirkîyê qedexeye. Û gava ku meriv nikaribe bi zîmanê xwe bistirê, ya jî bi xaxîfe, wek em dizanin her tiştê wî diçe. Ew kesên ku sitranên Kurdî dikin Tirkî ez dikarim bibêjim ku karekî ne baş dikin ew xiyaret e. Lê li aliyekî jî ew sitranbêj mecbûr e. Ew kesên dixwazin sitranên Kurdî bibêjin, dibê yan derkevin der, yan jî eger li Tirkîyê bîminin nikarin bi Kurdî bibêjin, mecbûr in sitranên Kurdî bikin Tirkî, ev aliyek e. Bes aliyekî din em ne faşist in yan ne sovenist in, em bixwazin nexwazin millet jî hev tesîrê digre. Pirr tiştên wisa hene, ku miletek jî kulturêa miletekî din istifade dike. Li Kurdistanê Îranê jî ev kar bûye. Mesele jî bo numûne, her çend rewşa Kurdistanê Îranê ne wek Kurdistanê Tirkîyê be jî bes cardin gelek hunermend hene ku sitranên

hêtir e.

Armanç: Muzîka Kurdî hin qalikê xwe yê "qilasik" neşikandiye. Lema jî bêtir jî alî Kurdan ve te guhdar kirin. Heta qîrnên nuh radibin jî pirr razbetê ve muzîkê nakin. Ji bo ku cilên nuh û kesên xerîb jî bikaribin li muzîka Kurdî guhdarî bikin gelo divê meriv çi bike?

N. Rezazî: Derxistina muzîka Kurdî ji çerçewa qilasik bi dîtina min bi tenê ne karê sitranbêja ye. Çimkî sitranbêjên me hemû bi nota û solfêy nîzanin, bi zîman û ilmê muzîkê nîzanin. Ez dikarim bibêjim hemû sitranbêjên me wisa ne. Meselen çend kes hene ku berê ne sitranbêj bûne, berê ew sazband bûne, instrument lîxistine, piştî wê sitran jî gotine, ew tiştêkî din e. Çimkî berê, wî nota xwendiyê û dîre jî karê sitranbêjiyê kiriye. Bes jî sitranbêjên me yên bi nav û deng kes bi ilmî û bi zanistî bi muzîkê nîzanin û muzîk bi kar neanîne. Yanî sitranbêjên me bes dewra sitranbêjiyê dîtine. Yanî nexşê sitranbêjê dîtîye û tiştêkî din na.. Bi dîtina min ev bi tenê ne karê sitranbêj e, jî wê zêdetir karê yekîtiya muzikarên Kurd e. Lê li alî din jî bo vî yekê kar jî bûye. Wek numûne li Kurdistanê Îran û li Kurdistanê Iraqê ew kar hatiye kirin. Bes jî ber ku li Kurdistanê azadiya me tune ye, her gava ku muzîk xwestiyê xweş bibe û pêş bikeve berî lê girtine û lê xistin e. Yan ne, jî alî pirr hunermendên Kurd li Kurdistanê Îran û Iraqê ev kar hatiye kirin.

Çirok

I

Di ser roja ku cendirman, bi potînan deriyê mala Biro vekirin û pîrsa kurê malê Mistefa kirin re, deh sal derbas bûbû. Jê pê ve sal ne diçû ku wan pîrsa xwe çargîsnî nekirina.

Biro û jina wî Fatê, çilo roja pêşî bersîva xwe bi nîfir, gotin: Xwedê çavên me derxîne, heger me ew dîtibe! "Wilo jî her sal heye nîfir li xwe dikirin, da ku cenderme ji wan bawer bikin û bê lédan dest ji wan berdîn.

Heger Fatê li ber cendirman kêmgotin bû, lêbelê bi mênê xwe re li ser kurê xwe pitpitokî bû û qonaxa peşî ji rewa wî, roj nediçû ku qala wî nekira. Herçî Biro, wek hemû zilaman êşa nava xwe nedida der û di pîrsa kurê xwe de, yek gotinbû: "Madem ku wî ev rê ji xwe re girt, ew îşê xwe çêtir dizane".

Bi xwe rojên pêşî ji windabûna Mistefa, bav û dê dilê xwe dixistin cî û digotin: "Madem lê digerin, mana xwe ew ji tehlûkê xilas bûye" û pêla ku wan bihîst ku Mistefa tixûb derbas kiriye û gihîştîye welatekî Ewropî, hemdê xwe anîn û Biro ji kevaniya xwe re got: "Keçê bi carekê kevirekî têxe ber dilê xwe. Her nema tiştêk pê te, qey Xwedê li halê me nerî û ew ji nav lepên wan bênamûsan filitandin! û hemdê ji Xwedê re vaye kurên me Husêno û Ehmedo li ber me ne bi ku de herin wê de-destê me bighê wan..."

Fatê ji neçarî emrê xwe spart Xwedê û her ku sal bi wir de diçûn, ew kêmgotin bû, diponijî û bê hêvî dibû. Lê dilê wê tenikîr dibû, hema ku qala Mistefa dibû, bêdeng hêwir dibarand.

Di dema dawî de bi çûyin û hatina kesên ji derve û yê hûndir bi ser hev de, dilê Fatikê jî xurçilî û rojekê ji mênê xwe re got:

- Heram ez dibînim, te ciyê xwe xweş kiriye û tu nema li lawê xwe difikirî. Ma tu nabînî xelk çilo bi ser hev de diçin û tîn?

Biro keserek veda û got:

- Hî, dîsa cinên te hatin te? - Biro seraser tonê gotina xwe guhert û got; Ma qey ez naxwazim wî bibînim?

Na, tu naxwazî... Heger te bixwesta te yê jî çarek ji me re bidîta...

- Keçê hovê, ma ne kesên ku tînhêlûke li ser van tune, ma te ji bîr kiriye ku Mistefa jî telebe bû û efû ji teleban re tune? Lê herçî çûna min û te? Him...De werin vê ecêbê! De werin vî hiştîrî di qula derziyê re derbas kin! Ez û tu û welatê Ewropa?

Fatê di devê wî de got:

- Heger tu naxwazî bi min re werî, ezê bi tena xwe herim...

Biro bi qerf kenîya û got:

- Here... ma kê bi destê te girtîye? Dûre bi niv xeyd berdewar kir: Here, ma ne tuyî ya diçe pişt xênî û nema rê dibe ser malê, îca tu yê çilo herî wê dîra ha?

Fatikê jî bi xeyd lê veğerand û pîrsî:

- Ma xelk çilo diçin?

- Keçê, xelk xelk in û em in in... Perên wan hene û lawên wan ne wek ê te mehkûmê dewletê ne...

Fatikê hinekî deng ji xwe bîrî û bi dengêkî xemgînî got:

- Baş e, mane Mistefa nivîsîbû heger lazîmiya me û peran hebe, ewê bişîne...

- Ma lazîmiya kê ji peran re tune? Biro gotina jina xwe bîrî û got:

Bela bişîne, tiştê ku ew dişîne ribayê xelkê nake...

Biro û Fatikê, di pîrsa peran de diêşîyan. Her dema ku dibihîstin; vaye kurê filan ji Almanîya wîqas pere şandîye û ji Siwêdê hîn bêtir tene şandin, wan lome ji Mistefa dikirin û digotin: "Gelo çima lawê me wilo qelipiyê dike?"

Bi xwe her dema ku pîrsa pers û Mistefa di hate meydanê, bav û dê bi gazinan didan ber hev, lê ku yekî ji wan ev sînor derbas dikir û bi gotina xwe Mistefa diêşand, ê din qebûl nedikir û ew diparast. Lêbelê, bi awakî giştî ew di wê nerînê de bûn: "Çilo heq bi wan re heye, wilo jî heq bi wî re heye. Ma kê dizane belkî ew peran jî dicivîne, ji bo ku li wan deran ji xwe ra jinekê bîne!..."

Dûre, vê pîrsê wî şax dida, heya dihişt ku Biro biheyire û nema bizanibe çî bibêje. Ji ber vê yekê, êdî wî nema xwest bi jina xwe re bide pey vî babetî. Loma bi awakî din, bi nermayî gotin ajot:

- Baş e, em bêjin, emê peran peyda bikin û te bişînin, (Fatikê, bi vê gotinê re guhên xwe mûç kir, da bêtir bala wî bişkîne ser gotinên xwe. Biro hinekî rawestîya û dûre berdewar kir), ma ne qaşo tu Musilman î, tu yê çilo bikaribî nimêja xwe li welatê gawiran, bikî?

Devê Fatikê jî ber vê xebere jî hev ma, ji ber ku ev tişt berê neketîbû bîra wê. Bîstikek neçû û Fatikê got:

- Ê kurê me, ma ew jî ne Musilman e?

Wê got, seraser hat bîra wê ku pêla Mistefa li bajêr dixwend, gava dihat gund nema nimêj dikir. Fatikê dîna xwe didaye ku ne tenê kurê wê nimêjê nake, her wiha hofka pê re jî wek wî ne.

Bi vê bîranînê, Fatokê dît ku bi vê yekê heq di destê mênê wê de ye. Wê bi çavên şikestî li Biro nêrî. Ku awirên wan li hev ketin, wê nas kir ku ew bi hîlebazi dide pey wê. Loma wê bi awakî ji xwe razî gotin domand:

- Ne xem e, çawa be ezê ciyê sicada xwe li mala Mistefayê xwe bibînim...

Biro bi xeyd gotina xwe da rûyê wê:

- Ez dibêjim nêrî ye, tu dibêjî bidoşê! Keçê ma ne heya misîn jî li wira tune ne...


- Ma çilo û bi ci ser çavên xwe dişon?

- Ez çî dizanim, qey bi araqê dişon...

Heya vira axaftinê bi vî rengî ajot û jê pêve bi awakî bêçej berdewar bû. Bi xwe ji wê rojê û bi vir de, Fatikê da ser piştê mênê xwe û ji pîrsa çûnê daneket. Jdî Biro ji neçarî ji kurê xwe Husêno ra got:

-Lawo de rabe ji birê xwe re mektubekê yazmîş bike û bişîne. Dîyare nema tebata dîya we tî... Qey ew jî dixwaze wek bajarîyan xwe çim rût û lêvsor bike...

Li gel ku Fatikê bi gotinên mênê xwe yê bi qerf hesiya, lê wê xwe nexist nav gotinê û mîna ji xwe re bibêje: "Zimanê xwe



bigre, de ew çî dibêje bela bibêje".

Husêno jî li ser daxwaza bavê, qelem û kaxez anî û got:

- Ez çî binivîsim?

Biro, dîsa ne bê xeyd û qerf got
- Ji xatûna dîya xwe bipirse tu yê çî binivîse, çima tu ji min dipirsî?

Fatikê ne bê mane bişîrî û Husêno li bav û dîya xwe rabû û got:

- De bes wek mişk û pisîkê herin hev, (wî berê xwe da bavê xwe û got), de ka bêje ez çî binivîsim!

Biro dît ku bi ya lawê wî ye, ji ber vê yekê ew çû ser naveroka nama ku dîyabû bihata nivîsandin:

- Jê re bêje ku em rehet in. Lê dîya wî dixwaze serekî lêxe... ew dixwaze wî bibîne û helbet em hemû jî dixwazin wî bibînin, lê ji Xwedê ve xwiyaye ku ji destengiye xwe em nikarin miradê dilê xwe bi cî binin... Jê re bêje bela ew heqê rê ji diya xwe re bişîne û piştî derxistina paseportê xwedê bê erê, emê wê bi rê kin...

Bi xwe Biro dixwest ku gelek tiştan bibêje û bi taybetî ji qala karê xelkê li Ewropa bike û çilo ew alikariyê bi malên xwe re dikin. Wî dixwest jê bipirse, çima ew di vî warî de, ji hevalên xwe maye. Vî tiştî dihişt ku ew bi ramanên xwe dîr here û bifikire; "Hebe nebe ew serserîtiyê dike û perên xwe bi araq û..." Lê belê devê wî bi van gotinan ne digerîya û li ser vê nerîna ne qenc di derheqê Mistefa de xwe gunehkar dît, çimkî ew di wê baweriyê de bû ku kurê wî ne yên van tiştê ye. Lê pîrsa hinartina peran bûbû devereke kul di bedena wî de. Ji ber vê çendê, her wî xwest hinekî ji tewirandina dilê xwe xwîya bike û Biro got:

- Bibêje, em dibihîzin ku hevalên wî yê telebe jî gelek peran ji malên xwe re dişînin... Gelo çima ew wilo hindikî ji me re dişîne?

Di vir de, Biro hîn bêtir germ bû û bi hêrs got:

- Jê re bêje, heger kar jê nayê, bela mûamela te û birê te çêke... Çawa be hînnê jê bêtir kar bikin, (Biro wiha got û di ciyê cî de li xwe veğerand) Kî dizane belkî hîn jî wek wî qelp derkevin?!
Piştî van gotina Biro dîsa xwê

bi birînê reşand. Careke din mefahîm li ber tev hev bûn. Rê li ber hate windakirin. Bîstikekê bêdeng ma. Fena ku ew di mênîyê xwe de, li pîrêza xwe û Mistefa vegere. Qînyeta wî ew bû ku kurê wî ne yê xirabyê ye. Û wî ji xwe re got: "kî dizane belkî ew perê xwe dide partiyê?" Bi vê pîrsê careke din dijiñ pê re çê bû; "ma ji wî pê ve kes tune ku alikariyê bike... Çima ev kar bûye wek toqa şeytên û ketiyê hustyê me?..."

Biro, ji nişka ve ji vê xurçila nava xwe, derbasî pîrsêk wiha bû ku ne jina wî û ne Husêno mebesta wî fahm nekirin. Wî pîrsî:

- Raste ku li Postexanê mektûban vedikin û dixwînin?

- Raste, - Husêno bi awakî alavî lê veğerand.

Biro keserek veda, fena ku baretî ji ser milê xwe bavêje, got:

-Madem wilo ye, gotina teleba ne hewceye ku tu binivîsî... Tenê bêje hevalên te ji peran dişînin...

- Hela tu gotinên xwe bibêjî, bêtir te ez dizanim ka ezê çî binivîsim û çî nenivîsim...

- Heger tu beyî min dikarî binivîsî, çima tu ji min dipirsî?

Husêno xwest jê re bibêje, ma ne tiştêk di tûrikê te de nemaye îcar gotinên min ji xwe re weke mehne, lê dengê bavê nebîr xwe û bêtir ku pê re bikeve gotinê, dest bi nivîsa mektûbê kir. Lê tevî wiha jî ji çarçeva qewîtiya bavê xwe derket...

Ev cara pêşî bû ku Mistefa nêma wiha bi gazin û bi lom ji malê girtîbû. Wî ji kêmgotinê xwe re, di dilê xwe de, xwe gunehkar kir. Bi giştî di derheqê malê de, lome ji xwe kir. Lê di pîrsa şandinê perên pîr de, xwîn lê tewirî û fena ku stîriyên çavbeloq di nav laşê wî de bin, wî tebat ji xwe re nedît. Bi xwe giyanê wî ji mênîyê ve bi vî tiştî hatîbû dagirtin û roj nediçû ku wî lanet li xwe û li hatina Ewropa neaniya. Wî pîrê caran ji xwe û hevalên mîna xwe re digot: "Xwezî em biketina zîندانan û me kerî bê şivan nehişt! Xwezî bi dojena welêt û ne bi bihuştê Ewropa! Di delî ku em zane bibin û bi şûnde veğerin, em man û me xwe û kadirên xwe jî wînda kirin..."

Erê, di vê pîrsê de, bi salan dilê Mistefa mişt xwîn bûbû. Ew bûbû berîka ber teqandinê. Jdî bavê bi nama xwe tilî danî ser zimanê tîvingê û kişandî Ji ber vê çendê, Mistefa bi dilekî tîje li ser masê rûnişt da ku bersîva malê bide. Lê berî ku kerba xwe di serê wan de derxîne, ramanên di serî de meyayî, di dil de hatin xurçilan-din: "Bavo, ew kesên ku tu cêlî wan dikî, erê li welêt rojekê ji rojan piling bûn. Lê niha, li vira, li derveyî welat ew bîne pisîk. Heger ew li ser çiyayê bilind difirîyan, niha baskên wan şikestine û li sikakên bajarên Ewropa nigên xwe li pey xwe dikişîşînin û her kes bi xwe da ketiye

II

Erê bavo, em hatîbûn vira û me digot emê bi zanetî xebata xwe bidomînin û dûre veğerin wêlê rizgar bikin. Lê nuha wiha bûye di şûna xebatê de, em bi avakirina qesir û qonaxan da ketine. Ma ji ber vî tiştî em mişext bûn? Na bavo, heqê kê û vî tiştî

hebe, lêbelê wê heqê me tunebe. Ji ber ku ew mîletê ku em li ser navê wî hatine vira, hîn bindest e û çavê wî li riya veğera me ye.

Bavo, Ewropa em bi cî kirin, ne ji ber ku ez kurê Biro bûm û yê din ên Hiso û Silo bûn. Em hatin hewandin, çimkî em nûnerê mîletekî bindest û bêmaf bûn. Bavo heger ez peran ji bo avakirina konaxan ji te re bişînim, bi milyonan devên birçî hene, ku pêwîst e em nan bidin wan, ma ez dikarim wan tîr bikim? Bavo, ma wê kêpera ji merovên şêhidên me re bişînin? Ma ew ji me hemûyan ne ewletir in? Vaye ez lawê me me û li Ewropa bi xweşî dişîm, lê yê wan? Bavo, bizanibe, ev nanê ku em dixwînin, erê bi xweydana eniya me ye, lê xwîna şeydanan jî tê de heye... Ma heqê kê heye ku wan jê bêpar bike?

Bavo, ez dizanim rewşa we ne xweş e, wilo jî ez dizanim heqê we heye ku hûn bi xweşî bîjin... Lê bibihure ez nikarim perakî zêde ji we re bişînim. Ez nikarim dest ji xebata xwe berdîm û xwe bîspêrim hevdana peran...

Mistefa dixwest bi nivîsa van gotinan hinek kulan ji dilê xwe derxe. Lê wî dizanîbû bi vî tiştî ewê derdê malê pirtir bike. Ji ber vê çendê jî wî xwe dîrî vê pîrsê kir û bi tenê li ser hatina diya xwe nivîsand û kêfa xwe pîr bi sefera wê anî...

Bi rastî jî Mistefa bi awakî însanî dixwest çavên dê yê li ber riya hatina lêw qerimî, hinekî bi hev dîtîna şa bike. Wilo jî wî dixwest serê xwe deyne ser sînga diya ku di biçûkaniyê de hilma sîrê wê dida bêvilê, careke din bîhn bike û zarokîya xwe bi bîra xwe bine. Wî dixwest bi însanîyetî li hemberî dîya xwe rûne, da ku çavên wan ji dîtina hev tîr bibin. Wî dixwest ji devê diya xwe gotinên wê yê kêm, lê pîr şêrî û dîlovan bibihîze...

Bi xwe, ev daxvazek herî hindik bû, ku divyabû bêasteng biçûya serî. Ji ber vê yekê cara yekem bû ku Mistefa perên wilo pîr (hezâr dolar) ji malê re hinart û zû bi zû dest bi mûamela hatina diya xwe kir...

III

... Û di dawîya dawiyê de ew roj, roja ku Fatê xistin balefirê û berê wê dan Ewropa hat. Berî vê rojê bi çendakî birûskêk li ser hatina wê ji Mistefa re hinartin. Di eynî bîstika ku Fatikê bi hewa ket, kurê wê jî berê xwe da balefirgehê da ku wê pêşewaz bike. Ne dê di balefirê de û ne kur di balefirgehê de, cî ji xwe re nedidîtin. Li gel ku sedema vê qeleqê nêzîkbûna hevdtîna ku bi salan li hêviyê mabûn, lê belê her yekî li gora xwe çavnerîna rê dikir. Diya ku bi salan ji dîtina lêw bê hêvî bûbû, vaye li ser riya wê bîstika ku wê dawîya dawî, çav bi hevdtîna şa bibe. Mane kur kezeba dçye û tiştê herî şêrî li ber dilê wê, ew e!

Û kurê ku bi salan mişext bûbû û dîrî welat ketîbû, ku hezkirina wî ji dê re tevî hezkirina dayika niştiman bûbû û ku her tim hezkirina dawî bi ser a pêşî digirt, vaye wî jî pîxêla xwe vekirîbû ji bo ku sîrek bayê hênîk ji rexê welat li sênga wî xîne, dimîne...

Î. Beşikçi:

"Heta ku Kurdistan koloniya Tirkîyê be, Tirkîye nikare têkeve Civata Ewropayê"



Di 18'ê Nisanê de alimê mexas û dostê gelê Kurd ê mezin Dr. Sosyolog İsmail Beşikçi ji ber pirtûka xwe ya "Devletlerarası Sömürge Kürdistan" (Kurdistan; Koloniya Nav Dewletan) di DGM ya Stenbolê de hat mahkemekirin. 100 awûqat û zêdeyî 400 kes beşdarî mahkemê bûn. Di nava van kesan de; Berpirsiyarê Amnesty International ya beşê Tirkîyê, Helmut Oberdiek, Sefîrê Hollanda yê Stenbolê Jonkir Roelants, parlamenterên Kurd İbrahim Aksoy, Husnu Okçoglu, Serokê Komela Mafê İnsanî ya Stenbolê Emil Galip Sandalcı û gelek rojnamevanên biyanî hazir bûn.

Wexta Beşikçi ket salona mahkemê kesên di salonê de bûn, hemûyan bi hev re jê re li çepikan xistin. Hakimê mahkemê li ser vê hêrs bû û got ku "vira ne

tiyatroye, herin li derve li çepikan xin." Awûqatên Beşikçi li ser van gotinên hakim gotin ku, "Em li derve li çepikan dixin jî hûn dîsa wî digrin."

Beşikçi di parastina xwe de tiştên ku di pirtûka xwe de nivîsandibû dîsa bi mexasî parast. Beşikçi bi fakta li ser pîrsa Kurd û Kurdistanê sekinî û bi mesela Tirkên Trakyayê û Bûlgaryayê ve da muqayese kirin. Di pîrsa Ermenîyan de wî got ku masese, unîversîte û dewleta Tirk bi yek alî li meselê dinêrin û fersendê nadin Kurdan ku ew jî dîtinên xwe li ser vê meselê bêjin yan jî binivîsin. Di dawiya ifada xwe de Beşikçi got ku "Min, bi ilimî li ser mesela Kurdi xebat kiriye, tiştên ku min nivîsiye ez xwedî lê derdikevim. Û heta Kurdistan koloniya

Tirkîyê be, Tirkîye nikare têkeve Civata Ewropayê."

Di mahkemê de Berpirsiyarê "Weşanxana Alan" a ku pirtûk çap kiribû Ayşe Zarakol jî ifade da û wê jî îthamên mahkemê red kir.

Mahkemê dîsa li gora Xala Qanûna Ceza Tirkîyê a 142/3-6 (bi wasita weşana zeyfikirina hîsên milî û propaganda cûdaxwazî) jî Beşikçi re ji 7 salan heta 15 salan ceza xwest. Mahkemê; kitêba Beşikçi ya din ku demek berê bi navê "Bilim, Resmi İdeoloji, Devlet, Demokrasi ve Kürt Sorunu" (İlim, İdeolojiya Resmî, Dewlet, Demokrasi û Mesela Kurd) derketibû û hatibû qedexekirin; ew jî bi vê dawê ve girê da û mahkeme têxîrî 15'ê Gulanê kir.

"Qerarnamên SS"

Teşkilata polis û alaya leşkerî bi firehî wê li van bajarên bête damezirandin û hîn hêsan wê herêmê tekin bin kontola xwe.

50 hezar memûr û 40 hezar jî karkirên bi kadroyê wê jî Kurdistanê re bê dayîn û maaşên personalê Kurdistanê jî wê bê zêdekirin.

Pişî ewqas esker û polis, "Tîmê Xusûsî" û "Caşên gundan" dijî kolonyalist îcar di bin navê karkir û memûran de 90 hezar muxbîr li Kurdistanê bi cî bikin.

Bi destûra waliyê herêmî wê grew û lokawt bîn çekirin.

Pişî ku ew qanûn ket pratîkê hukûmetê grewa "Çimse İş" qedexe kir. Vê grewê 18 hezar karkir digirt nav xwe. Yanî karkir jî bo mafê xwe yê ekonomîk û demokratîk jî êdî wê nikarbin grewan çekin û heqên xwe bixwazin.

Xusûsiyeta "Qerarnamaya di

Hukmê Qanûnê de" ewe ku, bîyî muzakera Meclîsê, ev biryar tîstendin û tavilê dikeve pratîkê. Partiya SHP û Partiya DYP piştgiraya xwe jî wê qanûnê re nîşan dan. Tenê li dijî nuxteyên surgûn û sansorê "endîşên" xwe bi hawakî pasîf û formel dan xwiya kirin. 18 parlamenterên Kurd li dijî qanûnê reaksiyona xwe bi du rojan terknekirina Meclîsê anîn zimên.

Di çerçewa navnetewî de jî li dijî vê qanûnê reaksiyon hat nîşandan. Reaksiyona herî xurt ji Partiya Keskan a Almaniya Federal hat. Partiya Keskan bi vê munasebetê ji Serokkomarê Tirkîyê Ozal re nameyek şand. Di namê de tê gotin ku, "Heger ew qerarnamê neyê iptal kirin, emê li dijî turizma Tirkîyê bangeke fireh derxin û di vî warî de Tirkîyê boykot bikin"

Di raya giştîya Tirkîyê de ew qerarnamê wek "Qerarna-

ma 413'a", "Qararname Terorê", "Qerarnamaya SS" (Qerarnamaya Sansur û Surgûnê), "Tahrîr-î Sükun" tê bi nav kirin. Yanî bi çî navî dibe bila bibe, dewleta zordar ya Tirk tedbîrên ku hata nuha li Kurdistanê stendibû; "Waliyê Herêmî", "Tîma Xusûsî", "Caşên Gundan", leşker û polis, giştên van jî li hember têkoşîna gelê me yê mazlûm pere nekir, wê ev qerarnamê û tedbîrên nuh jî pere nekin. Ji ber ku gelê Kurd êdî tirs ji ser xwe avê tiye, bi kitlewî û bi tevgerên curbicur li ber xwe dide, şûra netewî bi pêş ketiye, şiyarbûna millet gihîştîye merheleyek bilind; xelk dizane ku ew Kurd in û jî bo wê jî di bin teror û zulmê de ne.

Ji aliyê din ve, bi qanûnên xusûsî carek din eşkere bû ku Kurdistan "koloni"ye û jî bo îdara wê jî qanûnên taybetî lazim e.

Hindik-Rindik

Ciyê me gişan tê hil tê

Li Almanyayê karkerekî Tirk jî bo ku zarokê xwe yê nuh bûyî qeyd bike bi lawê xwe yê 4-5 salî re dihere Konsolosxana Dusedorfê. Mamûrê bi karê qeydkirina zarokan mesûl e jî bo ku lawikê xwînşîrîn bide peyivandin, dibêje:

- Tu ji birayê xwe yê nuh hez dikî?

- Erê, ez jî hemû birayên xwe jî hez dikim.

- Çend birayên te hene?

- Em çar heb bûn, nuha bûn pênc.

- Maşallah, muheqeq nuha mala we pîrr mezin e, çimkî odak raketinê qîmî we gişan nake.

Li ser viya lawik dibêje:

- Qîm dîke, dîke, jî me hemûyan re jî cî heye. Em nivînen xwe di ber hev de radixin, wê çaxê ciyê me gişan tê hiltê. Ciyê diya min jî tê hiltê. Bes cî jî bavê min re namîne, ew jî li ser zikê diya min radikeve.

Hêviya ji berçavkê

Yekî gundî jî bo ku mektûba xwe bide xwendin çû ba muxtarê gund.

Muxtar jê re got;

- Heyran welle nuha berçavka min ne li ba min e, lema jî ez nikarim bixwînim.

Mêrikê gundî çer jî ba muxtêr rabû, hema wê rojê lîxist çû bajêr. Li bajêr çû ser gozlekçiyekî (optîkerekî). Ji gozlekçî re got berçavkekê bide min. Gozlekçî kîjan berçavk da ber çava pere nekir; tim got, "Bêfêde ye, ez nikarim pê bixwînim"

Gozlekçî gelek heb li ber hev guherand, lê feyde nekir; tim got, "Bi serê te bêfêde ye, ez nikarim pê bixwînim."

Dawiya dawiyê mêrik westiya, jê re got:

- Nuha xwendin û nivîsandina te heye ya na?

Mêrikê gundî keserek jî kûr kişand û bi hawakî matmayî got:

- Heyra heyra, ku xwendin û nivîsandina min rebenê Xwedê hebûya, ma çima minê bihata berçavk ji te bixwesta.

Min got qey tu teyrî

Yekî gundî jî xwe re li taxeke bajêr digeriya, bi carekê de di paca malakê de çavê wî bi papaxanekî ket. Ev cara pêşî bû ku papaxan didît. Lema jî perrên papaxên ên reng rengî gelekî bala wî kişand. Ji xwe re di ber xwe de got:

- Ey Xwedayê e'rs û e'zman...ji hîkmetên te nayên gotin.

Çi teyr û tuyên te yên xerîb hene?

Tam wê gavê papaxan peyivî, got:

- Tu çî mêze dikî?

Mêrikê gundî li hember vî dengê papaxan şaş ma, got:

- Li qusûra min nenêrî bira, min got qey tu teyrî..

Awistralya, Tirkîye û Kurd

Li Awistralya hersal di meha Nisanê de li ser ANZAC pîrr tê peyivandin û nivîsandin. ANZAC (Australian and Newzealand Army Corps) dide. Ev hêza; leşkerên Awistralya û Zelanda Nû di Şerê Cihanê yê Yekem de çûne alîkariya Îngilîzîtanê kirine û rolek mezin listine. Hezarên wan di şer de mirine û birîndar bûne. Nav û dengê ANZAC bêtir di şerê Çaneqelê de derketiye. Armanca çûyina wan a Tirkîyê ev bûye ku gewriya Çaneqelê bi dest xin. Lê li hember leşkerên Ataturk ew bi ser neketine. Îro parastina gorên şehîdên ANZAC'ê li ser hukûmeta Awistralya bi 2 milyon dolar mal dibe. Leşkerên ANZAC du Çaneqelê, li Fransa û li welatên Rohilata Navîn jî şer kirine. Roja biranîna vê hêza leşkerî sal bi sal li Awistralyayê di 25'ê Nisanê de çê dibe. Di vê rojê de herweha rola leşkerên Awistralyayê di Şerê Cihanê yê Duwem û rola wana di şerê Vietnamê de jî têtê bi biranîn. Di her du şerên cihanê de jî leşkerên Awistralya bêtir bi Îngilîzîtanê re, û li Vietnamê jî bêtir ji bo Amerîka şer kirine.

Tirkîye vê rojê bo propaganda xwe bi kar tîne. Bi encema ANZAC û Çaneqelêyê ku li paytaxta Awistralya, bustekî ji mermer a piçûk a Ataturk çend sal e ku di quncikekî baxçekî de hatiye danîn. Îsal biranîna 75 saliya ANZAC e. Li Çaneqelê bi hezaran kes hatin ber hev. Herwiha Serokwezîrê Îngilîzîtanê Tacher, serokwezîrê Awistralya Bob Hawke û 60 leşkerên teqawud ên Awistralya ku umrê wan li ser 90'î ne. Keynî wan 500 leşkerên Awistralya jî û bi hezaran kes bi teyaran çûn Çaneqelê. Bêtirê 5 milyon dolar ji bo çûndin û hatinê hat xerckirin.

Li Awistralya gelek Kurd jî vê yekê bêhteng bûn. Roja serokwezîrê Awistralya jî bo vê munasebetê çû Tirkîyê komeke Kurdên bajarê Sydney ew protesto kirin. Ev protesto bû propagandeyek mezin li hember Tirkîyê ku ew li dijî gelê Kurd stemkariyê mezin didomîne.

Lê mixabin pressa Awistralya bi qasî ku cî da ANZAC ewqas cî neda bûyerên vê dawiyê ku li Kurdistanê Tirkîyê çêbûn.

Ş. B. Soreklî

Deyîrê Ma

Arêkerdox:
Malmîsanij

LEYLÊ (1)

Heywax, heywax, ez veşawo!
Heywax, heywax, ez veşawo!
Leylê, serî bonî bawkê to donga ya,
Binî bonî bawkê to donga ya.
Heywax, heywax! To heyron o.
Leylê, ez ha şono Suweyrono (2),
Kirya keno (3) dikonono,
Dekeno sayon û pirtiqalono (4).
Heywax, heywax! To heyrono.

Ti keynekta bextî ver di,
Tu ez xapeynawo, ca verdawo.
Heywax, heywax, ez veşawo!
Heywax, heywax, ez veşawo!

Serî bonî bawkî to kaş û kuş î,
Binî bonî bawkî to kaş û kuş î.
Bawkî to kutikê loxmon (5) o.
Leyli vejaya penceron,
Pey qorma (6) Leyli [di] xeberî dono.
Heywax, heywax! Ez heyron o.

1 Na deyîrî heway vatişê yew Pîrejmanijî nustiyay (Pîrejman yew dewa qezayê Pîranî ya).
2 **Suweyron** : Namey yew dew o.
3 **kirya kerdış** : kîra kerdış
4 **pirtiqal-i** : firtiqali, fitqali
5 **loxme** : lûxme, loqme, pîran
6 **qorma** : qûrna, korna temafilî, klakson

ÎNŞALA KEYE DÎ MONEW*

Ey hini ney o, ey hini ney!
Ey hini ney o, ey hini ney!
Ma şîyî inî binî,
Murey keyno bî vinî.
Ma şîyî inî binî,
Murey keyno bî vinî.
Ma geyray xwî rî diyî,
Yew mi rî, yew kektê mi rî.

Hêga sur û filhon ew (o),
Yew ha te de aw donew (dono),
Moneno bawkê keynnew.
Keynonê qijmo** nêdonew,
Înşala keye di monew.

* Na deyîrî heway vatişê yew Pîrejmanijî nustiyay (Pîrejman yew dewa qezayê Pîranî ya).
** **qijma** (qijme) : Vatişê vatoxê na deyîrî gore, "resaya", "pili" (**keyney qijmey** : keyney resayey, keyney pili)

AWKÊ KAŞON (1)

Vatox: Birader

Awkê kaşon wişina (2), lêro; wî lêro (3), lêro, wî lêro.
Awkê kaşon wişina, gidî; cêr a cor (4) surmeli yar.
Awkê kaşon wişina, gidî; cêr a cor surmeli yar.

Yo hanik (5) a xwî rî şina, lêro; wî lêro, lêro, wî lêro.
Yo hanik a xwî rî şina, gidî; cêr a cor surmeli yar.
Yo hanik a xwî rî şina, gidî; cêr a cor surmeli yar.

Desmacî (6) sibay ver di gêna, lêro; wî lêro, lêro, wî lêro.
Desmacî sibay ver di gêna, gidî; cêr a cor surmeli yar.
Desmacî sibay ver di gêna, gidî; cêr a cor surmeli yar.

Hor (7) vîcawo (8), hor' tarî, lêro; wî lêro, lêro, wî lêro.
Hor vîcawo, hor' tarî, gidî; cêr a cor surmeli yar.
Hor vîcawo, hor' tarî, gidî; cêr a cor surmeli yar.

Liyef erzeno (9) ser tîrmarî, wî lêro; lêro, wî lêro.
Liyef erzeno ser tîrmarî, cêr a cor surmeli yar.
Liyef erzeno ser tîrmarî, cêr a cor surmeli yar.

Wisar (10) biyero, ez tû biwazî, wî lêro; lêro, wî lêro.
Payîz biyero, ez tû biyarî; cêr a cor surmeli yar.
Payîz biyero, ez tû biyarî; cêr a cor surmeli yar.

1 No varyantê na deyîrî mi yew bandê (kasetê) Birader ê dengbêji ra guşdarît û nuşt.-Malmîsanij
2 **wişina** : wişena, xuşena
3 **lêro** : leyro, lero, lawo, lao, la, lo
4 **cor** : cûr, cuar, cuwar, cuer
5 **hanik** : hanik, honik, hinik, hanî, honî, hini (**hanik a** : hanî ya)
6 **desmac** : desmaj, deşmaj
7 **hor** : ewr, hewr, howr
8 **vîcayiş** : vîcayîne, vejyayîne, vicîyayîş, vîjyayîş, vijyayîş, vecîyayîş, vecayîş, vejyayîş, vejeyîş, vicayîş, vizyayîş, vizyayîş
9 **liyef erzeno** : lîf erzeno, çanqilênno
10 **wisar** : wesar, wusar, usar

TEVGERA RIZGARIYA KURDISTAN (TEVGER)

Vayênê Polîtîk ê Binî û Hedefê Programî:

Welatê ma Kurdistan, Pêymana sera 1639 Qasr-i Şîrîn ra dime wertê împaratoriyonê Osmanî û îran de parçebaye mend. Xelkê Kurdistan ebe destê hurd dewletonê zorbazu ame serdekerdene û pelexayêne. Waxto ke Şerê Dînya o Virê qêda, parçê Kurdistan ke binê destê Osmanî de bî, dewletê ke sîndorê xo gorê mênfatê emperyalizm amêy bêlûkerdene, wertê dîne de rêyna parçê bî.

Nêjdîyê di sêy ser a ke, xelkê ma dustê (zidê) zilm û serdebayêna girane û nîrê millî urzeno ra, bêhesav qirvanu dano. Çi esto ke na rawistên tede bi destê dewletonê zorbazu û gurê emperyalistu amêy siktene. Heta ewro kî xelkê ma Kurd parçebaye û hêşir mendo. Hetê dewlemendiya ser û binê hard ra welatê ma dîna ser o welatêki hewl o. Onca kî xelkê ma wertê feqîrênêda xoriye û pêysermayêna cemaatî (cîvakî) der o. Na dewlemendên, dewletê ke Kurdistan bare kerdo bi destê dîne û efendonê dînê emperyalistu ra tasnîna ra sona. Kurdistan bîyo kolonyeyeki parçebaye, avêşayêna dêy a ekonomîk (aborî) û cemaatî ama vîndemayêne. Miletê Kurd, bêhesav tevgerê (hereket) rawistên ardî mêydan. Waxtê ra dime nê rawistên bî tevgera azadiye û serbixoyî. A. Baban Paşa sera 1805'ine de suka Silêymanîye de, Mihemed Paşa 1814'ine de Rewandûz de, wertê 1842-46'ine de Bedirxan Cizîre de û Yêzdan Şêr 1855'ine de Çolemerîge de ust ra. Uzay ra têpa xelkê Kurd, bi verşayêna Şêx Ubeydullah Nehrî, dustê împaratorya Osmanî û îran de rawustenêda girse arde werte. Sera 1918'ine de ebe verşayêna Şêx Mehmudê Berzencî, dustê kolonyalistê İngilizî kî Kurdistanê İraqde rawistene pîyda bîye. Sera 1946'ine de binê îdara Qadi Mihemed de Cumhuriyeta Mehabadî amê sazkerdene. Na Cumhuriyeta Kurdistanê Mehabadî, sera 1947'ine de eve poşdayêna emperyalistonê Amerîka û İngilizî, bi destê kolonyalistonê İrani amê riznayêne. Parçê Kurdistan ke binê bandura Tirkîye der o, dêy de, rawistena Qoçgirî ya millîya sera 1920'ine ra dime sera 1925'ine de, ebe verşayêna Şêx Seîdî rawistenêda bine Pîran de dest na pi ra. Dêy ra dime seronê 1926-30 de, bi verşayêna İhsan Nurî Paşay Rawistena Agirî û sera 1937-38 de bi verşayêna Sêy Rizay, rawistena Dersim amê. Sera 1961'ine de bi verşayêna Mistefa Barzanî Kurdistanê Cêr (Başûr) de rêyna rawistene dest na pi ra. A rawistene hata 1970 amê. Pêymana Cezayîr a wertê kolonyalistonê İran û İraq ra dime a rawistene rijayênêda girse dîye.

Ewro xelkê Kurd, qe zu parçê Kurdistan de kî wayîrê heqonê netewî (millî) niyo. İmkanê zonê xo serbest qeseykerdene, kulturê xo avêberdene bile ci nêdîno. Dewletê kolonyalistî, miletê ma çînebaye hesab kenê. Na (bayêna dêy), bena sevevê terorê dewlete. Hêzên kolonyalist miletê ma çînebaye qewulkenê, sava vîndkerdena şexsiyeta dêy a millî (netewî) û kulturê dêy, sava rovilênayêne (vîndbayêne) û werte ra wedardayêna dêy, usulonê zor û hilu tédîne anê meydan.

Çi esto ke dismenê ke welatê ma kerdo parçê, miletê ma zincîre ra girê do, kerdena dîne, xelkê mao ke 25 milyan ra zêder o û welatêki hiray ser o wo, wastena xeleşayêna dêy werte ra wenêdarde, hata xoverdayêna (tekoşin) dêy a netewîye, na seronê pêyênu de wertê milêt de biye hewle û roze bi roze avê sona. Parçê Kurdistanê ke binê bandura İnan û İraq der ê, uzawu şerê partîzanîyêki hewl esto. Xelkê ma ordiyê modernê ke wazenê nê rawistene netewî biriznê, yînu kenno vila. Parçê Kurdistan ke binê destê Suriye der o, gelê (xelk) ma uza kî sava heqonê xuyê demokratîk û netewî kar kenno. Zor û zorbazêna ke parçê Kurdistanê binê destê Tirkîye de esta, zidê daye hereketo netewî rind avê sono. Dewletê ke na ra cor ser amo qalkerdene, nazay ser o kewtê telasêde giran. Yê ewro kî zê verê coy dustê miletê ma de dest danê ra zûvîn. Sava pelexayêna hereketê partîzanî, bi xeber û wastena İraqî, hucumê ordiyê Tırku kî eskera kenno ke na kar (destzuvîndayêne) çiqas avê şîyo.

NATO û zêde kî emperyalizmê Amerîka Zubayîye, avêşayêna hereketê millî yê Kurdistan ra rehsîz ê. Tersonê mênfatonê xo yê Rozamaya Wertî (Rojhilata Navîn) ver, wazenê ke hereketo millî bîro siktene. Uzay ra gore kî dewleta Tırku rê yêrdimêki girs kenê. Çi esto ke qewet û harêna dismen çiqas bena bibo, xelkê ma tekoşina xoya netewî ca nêverdano û wazeno ke ayê bero ser. Sava xeleşayêna welatî, waderdena zilm û vêsanên, sava jîyanêki (heyat) avêşayê û zê isonên, xoverdayêna ra qedêr zovîna rayê çîna.

Xeleşayêna welatê ma her çî ra avê eve (bi) destê qewetonê dêy ê esasiyu sona ser. A, hemeğdayên û xoverdayên û zuvînguretena hêzonê welatheskerdoux (welatparêzon) a ke gorê na tekoşina zore îcav kena, ancax bi dayê mumkun a. Zuvînguretena hêzonê welatheskerdoux, xelkê mênfanê şêr ardene, sava pûçkerdena dêk û dolavonê dismen şertêki esas o. Uzay ra gore kî ma hêzê ke amêyme tê lewe û TEVGERA RIZGARIYA KURDISTAN saz kerda, ma no ro xo ver ke parçê Kurdistan o ke bi destê Tirkîye bîyo koloni, nîrê kolonîstên o ke dêy ser o wo êy bisiknîme, emperyalizmi bîrjîme tever û Cumhuriyeta Kurdistanî a serbixoyî û demokratîke saz keme.

Programo ke roza ewroyêne de hêzê ma ser o bîyê hemfikir, programê şorêş a millî û demokratîk o. Vezîfo ke kuno vilê hêzonê welatheskerdoux ser, her çî ra avê siktene nîrê kolonyalistên a, siktene zilm û zorbazêna millî ya, rakerdena raya avêşayêna ekonomî û kulturê millî ya. Bi saya naye û şoreş hard ra eleqê feodalî û aşîrtîye, ekonomî û civakîye ke naza-uza Kurdistan de estê, bine ra riznayêna dîne û sazkerdena demorasî ya. Sava vurnayênê şoreşgerî kî her çî ra avê lazim o ke şoreş millî û demokratîk şero ser.

Sîndorê ke gorê mênfatê emperyalizm û dewletonê zorbazu û paşverunê dormî ke Kurdistan pê amo parçekerdene, yê hetê coxrafîk, ekonomîk û civakî ra zubayêna welatê ma rê asteng (engelê) ê. Xelkê ma virenîye ra hata nika, nê sîndor nas nêkêrd na ra têpa kî nas nêkeno. Ma hal-şertên miletê xo û mênfatê gelê xo ame verê çîmu, sava zubayêna welat kar keme.

Eskera wo ke qewetên kolonyalist û emperyalist bi riza, bê şer û gonriznayêne welatê ma ca nêverdane. Yine hata roza ewroyêne cuwavê wastonê millî û demokratîk ê gelê ma, bi zilm û zorbazên da. Yine ewro kî têpa sava siktene xoverdayêna gelê ma ordî û polisê xo seferber kerdo. Dustê naye de çekestene û bi usulonê bînu karkerdene heqa xelkê ma wa. Hata, bê na karê nanên xeleşayêna xelkê ma mumkune nîya. Vêzîfê mawo esas u wo ke ma hêzonê welatheskerdoux û şoreşgeru û bi hirayên xelkê xo, roza şoreşgerena ke karkerdene û fedekarêna girse wazena, sava dayê hazir kerîme. TEVGER sava serkewtene, karo polîtîk esas cêno û hal usul ra gore, usulonê na poşdayên û pakarkerdene ano werte.

TEVGER, tekoşina xelkê mawa xeleşayêna millî ya ke parçonê bînonê Kurdistanî der a, poşt dano daye; hêzê netewî û demokratîkê ke uzawonê, dest dano ra dîne û pa kar kenno. Hal ra gore usulonê na poşdayên û pa karkerdene ano werte.

TEVGER, raya wertaxe ser o, poşt dano qewetonê demorasî yê Tırka û dîne ra pa kar kenno. Dustê emperyalizm û hukmê burjuvaziyê kolonyalistî, heqa çarenaskerdene ke sazkerdena dewlete kî te der a, daye ser ittîfaq virazeno; hal ra gore usulonê na poşdayên û pakarkerdene ano werte.

Naye ra gore kî TEVGERA RIZGARIYA KURDISTAN (TEVGER) o ke ma pa saz kerdo, hedefê programê esasi ke na ra cêr yêne nîsankerdene, ey, yê nê ro xo ver, sava pêguretena dîne kar kenno.

Tevgera Rizgariya Kurdistan, hêz û grup û tek û tek isononê mayê welatheskerdoux ê ke na esasonê karê muşterek pê cênê, dîne rê rakerde. Bêrê nîro ke se seru ra hata nika vilê xelkê ma ser o wo, sava wedardena dêy, sava wedardena pêysermayêna welatî, sava sazkerdena jîyanêki newe dest zuvîn dîme. Sava kilmkerdena raya serkewtene, sava zehmet û feqîrên wedardene dest zuvîn dîme.

Zarok ne listika me ne

heta payîzê bimîne. Heger payîzêr nekeve, bêyî qîrş û qal tişteq li erdê namîne. Gîha, biharê tê çînin, rîsî biharê çê dibîn.

Viya jî tarîfa "şev û rojê" ye:

"Hiv û stêrik wînda dibîn." **"Hîv şevan hîv dibe û dinê ronak dike."**

Ew mamosteyê ku ew tekst nivisandiyê gelo ew bi xwe ne muhtacî fêrbûna Kurdî ye? Yekî ku jî şeva hîvron re bibêje, **"Hîv şevan hîv dibe û dinê ronak dike."** Ma çî heqê wî heye ku tekstên Kurdî bi-nivîsîne "mamostetîya Kurdî bike? Ma ev ne zulm û neheqî ye li zarokên Kurd?

"Piştî şivê gundî zû radîzên. jî ber ku, ew sibê de (îcar sibê de! L. B.) zû radîbin. Bajârî şevan dereng radîzên û dereng xew de (îcar xew de! wê di xew ra be L. B.) diçî?"

Heger astronomekî jî bîxwesta "şev û rojê" jî zarokan re îzah bîkîra, cardîn wî yê nîkarîbiya bi qasî vî mamosteyê Kurd numûnên baş û ilmî bidîta. Bes li gel vî jî, tiştê ez dizanim zivistanê ne cot heye, ne bêrî heye û ne jî palî heye. Bi şev, gundî piştî şivê wek mirîşkan hema nalûsin, heta dereng şevbêrka xwe dikin. Îcar li qeza me jî Memoyê Çopçî, Hemadînê qehwecî, melê camiya me, Filoyê firneçî sibê bi azana melê re radîbûn.

Piştî tefsîra ferqiyeta "şev" û rojê" bi vî rengê ilmî, di rûpeleke din de, di bin sernivîsa "Rojhilat-Roja" de ev numûna jêrîn heye: "Roj hilatîn-Roj çûn avan."

Belê zarokên Kurd li Swêdê bi zimanê diya xwe dîxwînin...(!)

X a ç e p i r s

Amadekar: S. Rêving

1													
2													
3													
4													
5													
6													
7													
8													
9													
10													
11													
12													

Çeperast

1-a) Bajarekî kevin li Kurdistana Tirkîyê ku ji demên berê û vir de cihêkî merkezi bû-ye ji bo ticaret û xwendina dînî. Di salên 1840' an de ji begîtiya Bedirxan Begî re bûye paytext. Her weha bajarê Mem û Zînê ye jî. 2-a) Di kurmancî de paşdaçekek (berevajî) b) Li devera Botan ji "biqîrêj", "gamarî", "qîlêr" re tê gotin. c) dermanekî xemilê ye, jin ji bo spehikîrîna çavan bi kar tinin (berevajî). 3-a) Li gundên Kurdistanê, li ber çem î rûbaran cihê ku jinîk kincan lê dişûn. b) Mêrê xuşka mirov. 4-a) Tenahî, ewlehî. b) pozîtîf, musbet. 5-a) Îbadetxana filehan. b) na, no, nexêr. 6-a) Pronavekî îşarkî ji bo kes û tiştê nêzîk. b) Xunav. 7-a) Henek, yarî. b) Li devera Beh-dînan: "îca", "îcar", "vêca" (berevajî). 8-a) Bi tirkî reqem "deh". b) bi 'erebî welatê "Çîn". c) Giş, tev, he-mû (berevajî). 9-a) Dewarek (berevajî). b) Nexweşiya nezle, per-sîv. 10-a) Kûçîk b)

Ekonomî, îqtîsad. 11-a) Di kurmancî de daçekek (berevajî) b) Gulî û gultvankên bi her çar rexên kefi, yan dersokan ve tînen dirûtin. c) Bi soranî: "gelo", "ma", "erê". 12-a) Maç, maç û mûç. b) Hucreyên ku mîşa hingivê de hingivê çêdike.

Serejêr

1-a) Pêşnavê yek ji mezîtirîn zimannasên zimanê kurdî. b) Cihê êmê dewaran. 2-a) Di kurmancî de daçekek (berevajî) b) Li Behdînan ji "rêwî" re tê gotin. c) Nexweşiyek. 3-a) Tişt, yan tiştên ku di kîs, yan çente, yan di her tiştêkî de ji bo

Bersîva hejmara 102'ya

Çeperast: 1-a) Mehdî Zana, b) es. 2-a) an, b) aşîfî, c) vî. 3-a) mîr, b) ûn, c) Şahîn. 4-a) ag, b) damanê. 5-a) sax, b) beyar. 6-a) trip, b) il, c) ta. 7-a) dirhî, b) ez. 8-a) sar, b) alîkar. 9-a) qemçûr, b) Maraş. 10-a) ud, b) savar, c) yê. 11-a) reş, b) etar, c) pîr. 12-a) emrux, b) bapêş.
Serejêr: 1-a) Mamoste, b) qure. 2-a) enî, b) ar, c) sedem. 3-a) xidam, c) şîr. 4-a) da, b) piç. 5-a) îşûg, b) ûsex. 6-a) Zîn, b) biharat. 7-a) at, b) delîl, c) vab. 8-a) nîşay, b) îmara. 9-a) amadekar. 10-a) har, b) zar, c) pî. 11-a) evîn, b) rayîş. 12-a) Sênegal, b) şêr

Dûmahîkên Nivîsan

LI DIJÎ EŞQIYATIYA...

gelê Kurd dimeşînin: û yê ku gelê Tirk qeyd û bend kirine, her yek hêz in.

Dijmîne me mişterek û doza me mişterek e. Biserketina demokrasiyê li Tirkîyê bi wê yekê ve girêdayî ye ku miletê Kurdistanê bigihîje mafên xwe yê milî. Loma jî divê hûn dengê xwe li hember rejîma dîktatorî ya dijimîne gel û azadiye bilind bikin ku niha berê êrîşa xwe daye gel Kurdistanê. Mil bidin tîkoşîna gelê Kurd. Li hember

dijimîne mişterek, bi birafî, mil bi mil divê em rawestînin.

Hêz û kesên pêşverû û welatparêzên Tirkîyê û Kurdistanê ku li derwayî welat in, divê ruyê reş ê biryarên terorî yê dewleta Tirk a kolonyalist derxin meydanê û piştgiyî naawnetewî bi gelê me re xurtir bikin. TEVGER, bi vî berpîrsiyariyê herkesî dawetî xebatê dike.

Roj roja xurtkirina tê-

koşîna gelêrî ya mişterek a birêxistinî ye ku divê li derva û hundurê welêt li her derê bê dayîn.

Gelekî ku xwe bike yek û bi bawerî rabe ser xwe, tu hêz nikare wî bişkîne.

Bi vî baweriyê em hewl bidin xwe.

Nisan 1990

TEVGERA RIZGARIYA KURDISTAN (TEVGER)

Û hev dîtin

Hîv berî ku Fatikê derbasî balefirê bibê, Biro û kurê wî Husêno, bê deng lê dinêrîn û heya qonaxekê wan xwe wînda kir. Ev cara pêşî bû ku Biro jîna xwe wîlo reben û pepûk dît. Û ne dûre ku ev cara yekem bû ku dilê wî pê şewitî û xwest wê hembêz bike. Wîlo jî daxwazek pê re çêbû ku çend gotinên jî dil û can ji kevaniya xwe re bibêje... Lê ew jî kete rewşa bêkêrî û belangaziyê û bêlebat ma. Tenê Husêno di vî rewşê de, dest bire xwe û ji diya xwe re gotinên xwe dubare kirin:

- Yadê metirse... Çend seet in û Xwedê wê biqedîne. Di teyarê de, te cihêkî vala li ku dît lê rûne... Kengî teyarê danî û xelk jê derketin tu jî bide pê wan ... Li derve, li ber derî wê Mistefa li bendî te be..

Erê ev ne cara yekem bû ku Husêno diya xwe bi van gotinan as dîkir. Lê belê ne dilê wê û ne yê wî ne dike tin cî. Gava de cihê polis derbas kir û bi tena xwe ma, Husêno fam kir ku wê dê rê nebe ser balefirê. Bi rastî jî Fatikê piştî çend gavan, xwe wînda kir û di cihê xwe de rawestiyayî ma û nema dizanîbû wê çî bike. Seraser Husên xwe avêt rêwiyekî û jê xwest ku ew jî diya wî re bibe alîkar. Divê ya xwedê bête gotin, vî rêwî li gel ku bi zimanê de nizanîbû, yarmetî pê re kir û di balafirê de li cihêkî da rûniştandin.

Fatikê jî di dilê xwe de hezar dua ji wî merovî re kir û di cihê xwe de kete hev. Wê xwe bi gerd û giyanê xwe dîrî xelkê kir, fena ku bi destmêj be, da ku kes ne hingive wê. Ew bi ramanên xwe yê tevlihev ma. Lê belê wênê kurê wê di nav van ramanên derbas dibû û mîna rewewkan diçû û dihat. Wê berê jî dêmênê kurê xwe dianî ber çavên xwe û carna jî di xewnan de didît, lê wek niha tenê zarokîya wî dihat ber çavên wê. Û pêla ku wê dida ser pelpeşkê û

neqebên jiyana kurê xwe, ew li ser qonaxa ku ew ji ber hikûmetê bûbû xwînî, radiwestiya. Di vir de her tişt di serê wê de tevlihev dibû û rê li ber wînda dibû. Lê hezkerin û dilovaniya wê her tim şiyar dima û cihê hoka dilê xwe wê jê re vekirî dihişt. Erê, raste kezeb, kezeb e û zarok li ber dilê dê yek in, lê yê ji malê dîr tim yê herî şîrîntir e...

IV

Mistefa, berî hatina de bi tebakê gihîşt balefirgehê. Xwest li cihêkî rûnê û bi xwendina rojnamê wextê derbas bike., lê demek dirêj neçû, rojname da alîkî û bê tebat li havîrdora xwe nerî. Her wext bi wir de ducû qelega wî zêdetir dibû. Cixare ji cixarê pêdexist û bi awakî alavî di navbera demekê û demekê li seeta xwe dînerî. Lê xwîya dibû ku wext bi giranî diçe. Ewî nîkarîbû li ser fikrekê ji yê xwe raweste. Wîlo jî wî ne dizanî, ewê çîlo pêrgî diya xwe bibe û çî jê re bibêje... Hîv berî roja hatinê wî bêhemdî xwe ji xwe pirsî: "Gelo ewê çî kincan li xwe ke û bê?" Wî bi xwe li xwe vegehand: "Xwê li serê min be, ma ji kincên Kurmancî û pîve, ewê çî li xwe ke? Heger merov ji ber gundiya diya xwe şerm bike, ewê jî ber welatê xwe yê bi paşê mayî jî fedî bike..." Bi van gotinan hate bîra wî ku hin hemwelatîyên wî, bi hatina de û xwişkên xwe, berî ku xelk wan bibînin kincên wan diguhertin... Vêga Mistefa li ser vî yekê got: "Ma bi guhertina kincên me jî û nezaniya merovan te guhertin? Diyar e, tevî ku em bi Ewrûpiyan re dijin jî, lê hin gelek ji me re divêt, da ku em di hundirê xwe de azad bibin!..."

Mistefa di nezalîya ramanên xwe de û qelega giyana xwe de ma, heya balefirê danî. Bi îlankirina gihîştina balefirê Mistefa ji cihê xwe çeng bû û bi lez berê xwe da deriyên ku rêwî

di wan re tînen. Li gel ku derketina de ji ciyên kontrolê hîn zû bû jî, lê her Mistefa awirên xwe li vir û li wira digerrand. Herçî rêwî bêetlahî derdiketin û her yek bi rêya xwe de dicû. Ji wana tenê pîreke Ewrûpî bala Mistefa kişand. Ew wîlo ji xwe ewle dimişya, fena ku ji mala cîranekî tê mala xwe. Bi derketina wê, keç û zilamek pêrgî wê çûn. Ya pêşî bi mana ramîsanê hema-hema lêvên xwe gihandin lêvên pîrê û seraser xwe bi paşê de vekişand û piştî çend gotinan re da merhebadana merovê pê re. Wî jî bi awakî alavî ew maçî kir û dîre bi lez, bi çend gavan xwe ji wan bi dîr xist û kodak ji hustiyê xwe derxist û wênak ji keç û pîrê re kişand. Piştî vî yekê çîlo bi lez ev pêşewaziya ha hate kirin, wîlo jî zû bi zû dan tengala hev û çûn.

Fatikê da xwe ku bipeyive, lê xwîn pê ve nehat û zimanê wê negeriya.

- Ne xeme, -Mistefa dîsa peyivî, - ev ji ber rî ye... De ka em herin malê!

Bi gotina xwe Mistefa kete bin çengê diya xwe û hêdî-hêdî ew meşand. Bi avêtina çend gavan hinekî ruh bi de de hat. Tebateke din meşyan û ji nişka ve de rawestiya, bi çavên mişt hêsir li kurê xwe nerî û di nav kelogiriyê de got:

- Lawo, şikîr ji vî rojê re ku min îcar jî tu dît.

Fatikê gihîşt ne gihîşt gotina xwe bibêje, borînek pê ket û xwe avêt milê kurê xwe. Mistefa jî bêhekê di nava xwe de foriya û wî jî bi gîriyêkî şewat li diya xwe vegehand...

Hîv kesên ku di ber wan re derbas dibûn, bi çavên seyr li wan dinêrîn û hinên din jî bi xemsarî dinêrîn û bi rîya xwe ve diçûn. Lê her du mexlûqên Xwedê, bêyî ku guh bidin kesî, heya demêke dirêj li salona balefirê hêhembezîkirî man...

Li dinê ev meh

LI DDR'ê Partiya Sosyal Demokrat û Partiya Demokrat a Xiristiyan li ser avakirina hukûmetekê ji alî prensîb ve li hev kirin û hukûmeta koalîsyonê ya yekemîn ava kirin.

Serokwezîrê Afrîka Başûr F W de Klerk di axaftineke xwede ya li parlamentoyê beyan kir ku ji bo derxistina efûyek siyasî xebat tê kirin. Serbestkirina girtiyên siyasî yên Afrîka Başûr yek ji daxwazên ANC ye. Di demek nêz de hemû endamên ANC wê bikaribin vegezin welatê xwe.

LI Zîmbabweyê di hilbijartina serokomarî de Robert Mugabe ji denga % 78,3(nêzî 2 milyon) stend û ji bo pênc salên din hat hilbijartin. Muxalîfê wî serokê partiya Yekîti(ZUM) Edgar Tekere ji denga % 16(nêzî 413.000) stend. Hilbijartin di 1'ê Nisanê de çêbû.

Serokê RRF Yaser Arafat di 6'ê Nisanê de li Watîkanê Papa Johannes Paulus ziyaret kir. Papa di axaftina xwe de piştigiriyê xwe ji bo dewletek Filistinî beyan kir.

LI Macarîstanê di 18'ê Nisanê de hilbijartina parlamentoyê çêbû Forum a Demokratîk a Muhafazakar(MDP) di hilbijartinê de piraniya denga stend û ji 365 kursiyên parlamentoyê 165 çî girt.

LI Yunanîstanê partiya muhafazakar Demokrasiya Nû di hilbijartinê de 150 parlamenter derxist. Bi piştigiriyê partiya Diana ku bi % 0.7 rayan parlamenterek derxist wê Demokrasiya Nû hukûmetê ava bike. PASOK ji denga % 38,6(128 parlamenter) û Yekîtiya Çep(komunîst) % 10.7'ê denga stend û 19 parlamenter derxist.

Partiya Kedê a Arnawûd di civîna xwe ya Komîta Merkezî de beyan kir ku wê hin reformên ekonomîk bêtin kirin û danûstendina diplomatîk bi DYA, YKSS û bi welatên Civaka Ekonomîk a Ewrûpayê re ji nuh ve bête danîn. Di axaftina xwe de serokê Partî û dewleta Arnawûdê Ramîz Alîa diyar kir ku siyaseta Arnawûdê li hember dinê wê hin vekirîtir be.

Serokwezîrê Çînê Li Peng û Wezîrê Karûbarê Derve Qian Qichem di 23'ê Nisanê de çûn Moskovayê. Ji sala 1964'an û wir de cara yekemîn e ku Çîn di sewiyêke wiha bilind de ziyareta Sovyetê dike. Çîn û YKSS li ser daxistina leşkerên li ser sînorê herdu dewletan li hev kirin. Li Peng di presskonferansa xwe de beyan kir ku herdu dewlet ji bo avakirina sosyalîzmê xebat dikin û tu dijayeti di navbera wan de tune.

Komîta Ewlekarî ya Netewên Yekbûyî di civîna xwe de biryar da ku li Nîkaraguayê hejmara kesên ku kontrola guhertina hukûmetê dikin, zêde bike. Berê hejmara van kesan 96 bû lê îro 260 kes e. Li gora biryarê wê 800 leşkerên Venezuelayê ji Namibiyayê bişînin Nîkaraguayê.

Wek tê zanîn Cepha Sandînistan di hilbijartina 25'ê Sibate de wenda kiribû. Seroka muxalefê Violeta Chamora bi % 55.2 reyan hilbijartinê qezenc kiribû.

ne karê aqîla ye lê rast e

Amadekar: Hesen Mizgîn

ADi 1'ê Çiriya Paşîn a 1755'an de: Li paytaxta Portekîzê; Lizbonê zelzeleyek pîrr mezin çêbû. Nûça vê zelzeleyê di 14 rojan de gihîste Parisê û Londonê û di dawiya mehê de jî gihîste Hambûrgê. Lê dema Neil Armstorng wek insanê yekemîn piyê xwe avêt erdê hîvê(1969) di 1,3 saniyeyê de nûçe gihîste hemû dinê.

ADi dema Sumeran -ku di navbera Dicle û Firat de xwedî dewlet bûnde qiralek hebû ku nameyên xwe li serê posteciye xwe dida nivîsandinê. Posteciye qiral pêşiyê porê xwe ji binî ve jê dikir û pişt re name dihate nivîsandinê. Posteci heta ku porê wî dirêj dibû dipa ku tiştên li serê wî nivîsandî neyê dîtin. Piştî ku porê wî dirêj dibû dida rê, diçû.

ADi 25'ê Temmûza 1909'an de Louis Blériotê Fransî cara yekemîn bi teyara xwe ya ji text, potik û tîlên piyanoyê çêkirî, ji ser Kanala Britanyayê firiya. Teyara Louis Blériot 100 kg. giran bû û di seetekê de 40 km. difirya. L. Blériot di 30 deqîqeyî de gihîste wî aliyê Britanya û 1000 pund qezenc kir.

ALi Hindîstanê ocaxa komirekê ji sala

1916'an ve dişewite. Li gor hesabên ku hatine kirin heya îro nêzî 37 milyon ton komir şewitiye.

ADi sistema rojê de planeta herî mezin Jupiter e. Jupiter jî dinê 318 car girantir e.

AIro şirketên şexsî ji berê xwe dane hîvê. Ew dixwazin bi sistemeke nuh li hîvê li avê bigerin. Li gor lêkolînên ku hatine kirin li hîvê hîn krater hene ku bin wan -200 derece sar e. Wek prensîp dibe ku di van krateran de qeşa hebe. Şirketek bi navê Space Studies Institute jî bo lêkolînek wiha 8,5 milyon dolar veqetandîye û wê satelîtek 150 kg giran bişîne asûmana.

ALi herêma Bracken Cave li Teksasê 20 milyon şebşok hene. Wek tê zanîn şebşok heywanek bi memik e û li dinê li tu cîyî hewqas heywanên bi memik tunene.

ATirêja laserê ya kesk dikare kevirê di hundir zirav de perçe perçe bike û tu zirav nede ziravî.

ASir li dijî çikandina xwînê dermanek pîrr baş e. Tansiyona bilind dadixîne û kolestrola xwînê kêm dike. Ji bil van, sir jî bo kesên ku bi nexweşîna şeker ketine dermanekî baş e; ji ber ku sir li dij zêdebûna şeker di xwînê de pîrr efektif e. Maddeya ku di sirê de jî alî tîbbî ve aktif e, jê re allicin tê gotin

Weşanên Jîna Nû

- Images Du Kurdistan de Turquie (Li ser Kurdistanê albûma Rîsman) Şuayip Adlığ
- Dengê Xêzikan(Pirtûka Karîkatûran) Mamoste
- 1925 Kürt Ayaklanması (Şeyh Said Ayaklanması) (xelas bû) Prof. M. A. Hasretyan, Dr. K. Ahmed, M. Cıwan
- Ronahî(Hemû hejmarên kovara Ronahî ku di navbera salên 1942-1945'an de derdiket)
- Jiyana Rewşenbîrî û Siyasî ya Kurdan (Di dawiya sedsala 19'a û destpêka sedsala 20'a de) Dr. Celîlê Celîl
- Büyük Anayurt Savaşında Kürtler (1941-1945) H. M. Çetoev
- Komara Demokratîk a Kurdistan(Mahabad) Kerîmî Husamî
- Roja Nû (Hemû hejmarên kovara Roja Nû ku di navbera salên 1943-1946'an de derdiket)
- Le Bîreweriyekanim- Cild-I Kerîmî Husamî
- Yüzyılımızın Başlarında Kürt Milliyetçiliği ve Dr. Abdullah Cevdet Malmîsanîj
- Zazaca-Türkçe Sözlük Malmîsanîj
 - Agirê Sinema Amûdê M. Ahmedê Namî
- Na Xumxum a... Arêkerdox: Koyo Berz
- Bir Kürtle Konuşma (Şiir) Adonis Buduris
- Herakleitos (Şiir) Malmîsanîj
- Dîwana Rûhî Şêx Abdurêmanê Axtepî
- Şairên Klasîk ên Kurd Abdulreqîp Yûsuf
- Hêsir û Baran (Kurteçîrok) Bavê Nazê
- Li Kurdistanê Bakur û li Tirkiyê Rojnamegeriya Kurdî (1908-1981) Malmîsanîj- Mahmûd Lewendî
- Zargotina Kurdên Sûriyê Amadekar: Dr. Celîlê Celîl
- Mîrsad-ul Etfal (Amadegaha Zarûkan) Şêx Mihemed Kərbela
- İki Dünya Savaşı Arasında Irak'ta Kürt Sorunu Prof. Dr. Şakîrê Xidoyê Mihoyan

Adresa Xwestinê:

Jîna Nû

Post Box: 240 12
750 24 Uppsala/ SWEDEN

Fîşa abonetiya Armançê

- Salek
- Şeş Meh

Abonetiya salekê

Li Skandinavya	120 Skr.
Li Ewrûpa	50 DM
Li derveyî Ewrûpa	35 \$

Tarîx:

Nav û paşnav:

Navnîşan:

Welat:

Postgiro: 50 37 99-9 Sweden

Heqê abonetiya xwe li ser postgîroya jorê bişînin. Fotokopiya kvîtoya heqê abonetiye û fîşa jorîn dagirin li ser adresa jêrîn ji me re bişînin.

Adres: P. Box 6004, 172 06 Sundbyberg/Sweden